



T Ê K O Ş E R



Hejmar 26

Adar 1985



revue trimestrielle

driemaandelijks blad

TEKOŞER: KOVARA TEKOŞER, YEKÎTIYA KARKER Û XWENDEKARÊN KURD LI BELÇIKA

NAVNIŞAN: B.P. 33 - 1730 ZELLIK - BELGIQUE

BUHA: 40 F.B., 2 DM, 6 FF.

N° BANKE: 426-3144071-85

K.B. - BELGIQUE

BERPIRSIYAR: M. Nezh YALÇIN

KOMITA NIVISKARIYE: Ahmed, Derwêş, Pervîn, Yalçin

KARÊN TEKNÎKÎ: Pascale DESRUMAUX

T Ê D A Y Î

8ê ADARÊ, CÊJNA JIN	R. 3	
JINA KURD	Xendan	R. 4
CINSÊ GOTINAN DI ZIMANÊ KURDÎ DE	C. Bedir Xan û R. Lescot	R. 6
ÇIROKA MUXTÊR	Firat Cewerî	R. 8
DÎROKA KURD Û KURDISTAN	Derwêş	R. 12
ISMAIL BEŞIKCI TEHLIKEDEDIR	R. 15	
KURDISTAN, ÇEND NOT LI SER JINA ABORÎ Û ÇANDÎ	Pervîn	R. 16
ROLA ROJNAME Û KOVARAN	Dr. Poloço	R. 19
COGRAFYA KURDISTANÊ DI ANSİKLOPÊDIYA ISLAMÊ DE	R. 20	
KOVARA JÎN	R. 26	
JÎN DERGISI	R. 27	
BÜYEREK LI AUSTRALIA	R. 28	
AVUSTRALYA DA BIR OLAY	R. 29	
XEBATA ME	R. 30	
TEKOŞER'DEN HABERLER	R. 31	

8ê ADARÊ, CÊJNA JÎN

Di sala 1857 de, bi sedan jinên karker li New York, li Emerîka, rêveçûnekê dijî karê 12 seetan kir. Ev rêveçûna dîrokî ji aliyê polîsê ku li hespan siwar bû bû hat pelixandin.

Piştî wê tarîxê, tevgerên dinên giran li derên din ên cihanê, ji aliyê jinan, çêbûn û hîn jî çêdibin. Ev nîşan dide ku pirsê jîn ne pirseke hêsan e û ku tevgera wê dûr û dirêj e.

Em di vê rûpelê de nikarin bi awakî kûr tehlîla vê pirsê û vê tevgerê bikin. Ji bo vê yekê, xebatek hêja pêwîst e. Emê di vê hejmarê de, di munasebeta cêjna 8ê Adarê de, bitenê çend gotar û wêne li ser jina kurd biweşînin. Em hêvî dikin ku di rojekê nêzîk de em karibin dest bi vê xebatê bikin.



JINA KURD

XENDAN

S e r e t a y e k

Rewşa jin di dîroka borî da

Jina kurd wek hemû jinên dinyayê bi hezaran sal di bindestiyê da jiyaye. Ji bo ku em ser rewşa jina kurd ya îro tiştêkî zanibin, bi dîtina min divê em paş da vegehin û rewşa jin di çaxa berê dîrokê da bibînin.

Mêr çî li deştan û çî di avan da mijûlê nêçîr dibûn, jin jî zarok xwedî dikirin, wan ji sermayê û ji tebayê hov diparast, gîha berev dikir jê derman çêdikir, li brîndar û nexweşa dinêrî, dewar kedî dikir, erzaq pas dikir, li ser rojên pêşî bîr dikir, biryar digirt û razê xweder (sirrê tebfetê) zanî bû.

Gava jin ev karûbarên bingehîn dikir, bi taybetî zarok anîn, mêr jê ditirsîya, ji wê ra rûmet digirt û bi gotina wê dikir. Di wî demî da jin xwediye raz û mucîze bû û bi vî awayî jî navê jin ket çîrok û efsane. Cadû, cin û perî tevda jin bûn. Di çaxa doza dayikêtiyê da zarok bi navê dê bûn û girêdayî êla (eşîr) wê bûn, bo wî jî jin xwediye hêzeke mezin bû.

Piştra sifir, bronz û hesin peyda bû, çek û alet ji wan çêbû, şer û lêxistin derketi bû. Ji ruyê şer mêr xwediye kar, aş û xwarin bû. Bi vî awayî asûna mêr berz bû. Bi vî awayî jî par kirina karûbar yê borî di nav bera jin û mêr da ser û bin bû. Karê malê ku jin dikir ket pilana didu.

Bi fire bûna milkîyeta taybetî, bi civandina mal û pare di nav malbatê da û bi daxwazî ya dom bûna dewlemendî pirsra guhastina saman (serwet) derket meydanê.

Bav dixwast ku zarokên wî xwediye mîras bin, çima ku ew xwediye her tiştî bû. Xwediye çek, alet, keriyê dewar û xwediye kole bû. Di doza dayikêtiyê yê da ev dewlemendî nediket destên zarokên wî yê ku bi navê dê bûn, diket destên xuşk û birayên wî. Mêr bi sedan sal şerê jin kir ji bo ku wê qels bike û wê ji textê rake. Jin jî dijî mêr rabû ji bo ku asûna xwe biparêze. Lê di dawiyê da mêr biserket û gihaşt daxwaziya xwe ya mezin. Asûna wî

yê civakî bû li gora rolê wî yê abûrî.

Bi vî awayî doza dayikêtiyê rabû û mafê dê jî di mîrasê da winda bû. Şûna zewaca bi pirê zewaca yekbûyî hat. Bi tenê mafê mêr hebû ku zewacê helweşîne. Şûna doza dayikêtiyê malbata bi xwedî hat. Mêr serokê malê bû û bavê zaroka jî bû. Ew her gav bavîtiyek zelal dixwest ji bo ku mal û milkên xwe bide zarokên xwe. Bi vî awayî ev cara yekim bû ku jin rastî şikestinek dîrokî mezin hat. Mêr serdest bû, jin jî bindest bû. Mêr xurt bû, gotina wî gotin bû, bi dîtina wî jî jin bitenê ji bo karê mal û anîna zarok bû. Ji dêliva ku jin girêdayî ya mala bavê xwe bûya, girêdayê mala mêrê xwe bû. Mêr despêkir wê bi tiştta biguhêre. Kuştin bû dawîya jina ku bi mêrek din ra pêwendî danîya, çunkî bi gûman li zarokê mêrê wê dihat nêrîn (dibe ku ji mêrek din bin).

Ji wê gavê ta îro çî di doza koletî, çî di doza feodal, çî di doza kapîtalîzm, jin du car bindest e : Carek ji aliyê civatê, carek jî ji aliyê malbatê.

Bi vî awayî jin ji aliyê mêr bindest bû. Bi vî awayî jî bindestiya çînî ya yekim di dîrokê da bindestiya jin bû. Dijwariya ol (dîn) ji dijwariya mêr nekêmtir e. Her çend ku ol li Erebiştanê jinan rizgar kir, lê hêjî rolek mezin dilîze bi jêrdestbûna jin. Di olên kevnare da jin nîşana zarok anîn bû. Li gora qanûna Manu û pirtûka Mûsa divê jina ku zarok nayne bê berdan û li gora pirtûkên hindî yê dî jî mafê wê di mal û milk da tune bû, ne jî azad bû. Hin fîlozof û nivîskarên yûnan dijî jin rabûn. Fîsagoros yek ji wan bû. Wisa digot : Dîsîplîn, ronî û mêr nîşana xêr e, bê dîsîplîn, tarî û jin nîşana şer e. Papên kilîsê jin wek dijmin dîtibûn û ew ber çavên wan nîşana Şeytan bû. Ji vî dijwartir jî peywendiya jin û mêr qirêj û heram bû, çima ku jin qirêj û heram bû. Bo wî jî zewac li keşa û papa qedexe bû.

Rewşa jina kurd li Kurdistan bi kurtî û bi giştî

Ji bo ku em rewşa jina kurd li Kurdistanê dizanibin, divê em li ser civata kurdî rawestin.

Civata kurdî civatekî feodal e, ji êlan (eşîran) pêk hatiye. Her êlek serekê wî heye. Ev serok jî rolek mezin di êl da dilîze. Ew xwediyê hêzekî xurt e û ew e yê ku biryar digre. Li gora ev civata feodal li Kurdistanê malbata mezin û tradisionel hatiye çêkirin. Ev malbata mezin patriyarkal e, di bin otorîta bav yanî mêrê seretirîn da ye. Cinsiyet jî di pêwendiyên malbatê da cî girtiye. Otorîta mêr tê tevav kirin bi karên malê ku jin dike. Ev tê gotin ku jin li mal û li civatê da ji mêr kêmtir e, jin jêrdest e. Ta nuha me du prensîp dît di malbata kurdî yê tîpîk li Kurdistanê. Prinsîpa siseyim yê girîng temen e.

Endamên malê yên ciwan pêwistin ku bi gotina endamên sere bikin. Bi vî awayî em di malbatekî feodal da ev sîstema jêrîn dibînin :

Mêrên sere

Mêrên ciwan

Jinên sere

Jinên ciwan

Zarok

Hin caran gava mezina malê (patriyark), ew e ku mêr e, tunebe jina sere ciyê mêrê ciwan digre, bitaybetî gava ku jin dêykî sere û çend kurên wê hebe.

Jinên kurd yê xurt û bijîr jî hene. Ew karin bi otorîta xwe serekê êlekî bibin û wek mêrekî karûbarên girîng bi cî binin. Lê ne gotin e ku jina kurd xurt e û serdest e, dikare biryar bigre û mêran bide dû xwe. Jimarê ev jin pir hindik e, tiştê hindik nikare di civatekî da bibe pîvan. Jina axa cixara xwe dikêşe û ser xulamê xwe diqîre û jêra gotinên neçê dibêje. Çima jina gavan nikare wisa ser mêrekî biqîre? Jina axa bi xwe ne xurt e, ne jî serdest e, ew bi tenê ji malekî dewlemend e. Ev rewş di civatekî da nabe pîvan.

Dûmahî heye



CINSÊ GOTINAN DÎ ZIMANÊ KURDÎ DE

C. BEDIR XAN û R. LESCOT (*)

Cinsê gotinan, ji derveyî meriv û lawiran

Bi awakî giştî, sedema veqetandina van gotinan di nav du cinsan de girêdayî awa (şikl) yan damezrana tiştan e, û yan jî, weka ku lîstên jêrîn nîşanî me didin, girêdayî ramanên (fikir) ku ev gotin didin nasîn.

Em bala we dikişînin ku rêzkirina ku me tecrube kir ne mutlaq e. Bikêrhatina wê ya sereke bitenê ji bo dayîna nîşanên giştî ye. Em di bîra xwe de dihêlin ku gotinên mê ji yên nêr pirr bêtir in.

Gotinên nêr

- 1) Ji sedema wekheviya wan ya rast, piraniya van gotinan tiştên tûj yan bilind nîşan didin. Lê, di vê qaidê de istisna hene.
- 2) Navên jimarên, ji xeynî yek.
- 3) Gotin û navên ku av û çeman nîşan didin.
- 4) Navên maddên xam û madenan.
- 5) Navên rengên ku weka nav (ne sifet) bi kar tên.
- 6) Piraniya gotinên ku maddên lawirî û şîrî nîşan didin. Istisna : hirî, liva, lorik, mê ne.

Gotinên mê

- 1) Ew, bi piranî, tiştên kûr, qulkirî, yan pan nîşan didin. Bi vî awayî, zinar nêr e, lê lat û fersî mê ne.
- 2) Gotinên ku cihên rûniştinê nîşan didin. Istisna : Kon, xanî, axur, stewl.
- 3) Ên ku gengaziyên (wasite) rêveçûnê (erebe, trê...) nîşan didin. Heta nuha, tu istisna ne hatiye dîtin.
- 4) Navên cografî (ên bajarên, welatan, çayan), ji xeynî navên çeman.
- 5) Navên hemî tiştên ku di ezman de ne, yan jî ên ku jê dikevin, û piraniya guhartinên iklîmî. Lê ezman bixwe û ba nêr in.

(*)

Mîr Celadet Bedir Xan û Roger Lescot, Grammaire Kurde (Rêzimana Kurdî "zaravê kurmancî"), rûpel 66-70, Librairie d'Amérique et d'Orient, Paris, 1970.
Wergerandin : fransîzî-kurdî : Pervîn.

6) Piraniya gotinên ku zeman û birên wî nîşan didin. Lê hin ji wan, di hin zaravan de, nêr in (li "Gotinên ku cinsên wan diguherin" binêre).

7) Navên nexweşiyên, êşan, birînan.

8) Navên xwarinên pijiyayî, ji xeynî nan û gotinên weka wî (li "Gotinên ku cinsên wan diguherin, c" binêre) û goşt.

9) Aletên mûsîqî û melzemên buroyan.

10) Navên çekan. Di nav navên çekên agirî de tu istisna ne hatiye dîtin. Lê navên van çekên bêagir nêr in : şûr, gurz, hiwêzî, şesperî, doqik; bivir, tevîrîn.

11) Bi awakî giştî, hemî gotinên ku meriv nikare, bi awakî mentiqî, ji wan re cinsekî bide, lê ku weka nav bi kar tên : navên tîpên alfabê, hoker (ad- verbe), pronavên (zemîr) ku weka pronavên bê cins ên hin zimanan in.

12) Bê istisna, hemî gotinên ku ramanekê (abstrait) ku ji girêdana paşdaniya "î" bi navekî eslî re tên ava kirin. Nîşe : Mezinahî, spehî, dirêjahî, mêranî, camêrî, xizanî.

Bîranîn : Gava ku navên bi "î" manayên wan "konkrêt" be, ew karin bibin nêr. Nîşe : Belekî (nêr) : lekeke berf (lê, belekahî "mê" : sipî û reş bûn). Karwanî (nêr) : merivê ku karwanekê dikişîne (lê karwanvanî "mê" : meriv di karwanekê de be).

13) Hemî raderên (mesder) ku weka nav bi kar tên : Nalîn, mirin, dayîn, jîn, xwarin.

GOTINÊN KU CINSÊN WAN DIGUHERIN

Ji xeynî yên ku me li jor nîşan da, emê lîsta gotinên ku cinsên wan diguherin bidin we :

a) Hin gotinên ku di eslê xwe de nêr in, lê ku karin bibin mê, eger merivê ku nîşan didin jin be. Nîşe :

Heval : hevala min. Dijmin : dijmina min. Dost : dosta min. Cîran : cîrana min. Mîr : mîra Botan.

BİRANÎN : Hin gotinên ku, di formulên edeb û terbiyê de, di manayê mecazî de (sens figuré), ji bo her du cinsan bi kar tên, tucar nayên guhartin (mê dimînin), weka : qurban, heyran, seyyan, gorî.

- b) Rengdêrên (sifet) ku weka nav bi kar tên, eger merivekî nêr nîşan bidin, dibin nêr, û eger yekî mê nîşan bidin, dibin mê, weka : delala min, delalê min.
- c) Hin gotin cinsên wan li gora mana diguherin. **Nîşe** : mal (mê), xanî; mal (nêr) : hebûn. Ben (mê) : erdê çandinê yê bilind; ben (nêr) : ji bo girêdanê. Savar (nêr) : ê xav; savar (mê) : a pijiyayî. Dar (mê) : a ku tê çandin; dar (nêr) : ê hişk. Navên bi "î" (li gotinên mê binêre).
- d) Hin gotin li hin navçeyan (bi awakî giştî, li Rojavayê) mê ne. Lê, cinsê wan, di nav navçeyê bixwe de tucar naguhere. Giringtirinên wan ev in : çax, wext, qeder û miqdar, sîng, kur-sî, balgih, xeber, tişt.



CINSE GOTINÊN KU JI DU GOTINAN AVA DIBIN Û Ê GOTINÊN BIYANÎ

Gotinên avakirî ku ji gotinên bi cinsên cihê hatine pêk anîn cinsê tişt yan merivê ku nîşan didin distînin : **Nîşe** : Dotmam "mê" (dot : keç, mam : ap). Qelem-zirêç "mê" (qelem "mê": navê melzemê; zirêç "nêr": risas).

Bi eynî awayî, gotinên biyanî ku bi kurdî bi kar tên cinsê ku navça vî zimanî dixwaze distînin. **Nîşe** : Hemam (mê), şimendifêr (mê), trêna (mê).

E z j î j i n i m

Bareş BATTE

Di lingên min de
Lastîkên reş
Î Selîm hostayê Enqerî.
Derpiyê min î delinfarah
Bi harîyê latimî
Heya kabokê min.
Sariya kirasê Çîtî
Di reilana zenîya min de xwîya ye.
Min mast anî bajêr
Di hewake bibaran
Li rêke biherî de.
Ez jî jinim
Bitenê di zayinê de
Weke jinên din

ÇÎROKA MUXTÊR

Firat CEWERÎ

Zarokên ku li dora gund dileyistin, gava ku çav li kamyonên leşkeran ketin, ber bi malên xwe ve bazdan û bi qîrîn bang kirin :

- Esker hatiiin ... Esker hatiiiii ...
Eskeer ...

Dengên zarokan li gund li hev vegeyriyan. Bi dengên wan re hemû gundî derketin ber deriyên xwe û li riyan nihêrîn. Gava ku çav li kamyonên leşkeran ketin, bi diltirsî û bê hêvî dîsan hemû bi paş de ketin hundir.

Şeş kamyon tije leşker û ketin gund. Kamyonên xwe li jêrî gund, li ba dibistanê sekinandin û wek kuliyan xwe jê avêtin. Dû re çawîş mîkrofon xiste destên xwe û bang kir :

- Mileet kes ji hundiran dernekevin! Yên ku ji hundirên xwe derkevin û bazbidin ew ê bê ne kuştiiin ... Kes ji hundiran dernekeviin ...

Bi banga wî re xortek ji gund derket û bazda. Leşkeran lê reşandin. Weke ku mirov xwê biavêje êgir, dengên teqînên tivingên leşkeran hat. Di wê deqîqê de, mirov digot bû ye ceng. Lê ew xort qet bê qidûm neket û nesekinî. Wî her reva xwe domand. Bi vizîni gule di ber guhên wî re derbas dibûn. Gule geh li tehtên ber wî diketin, perçek ji tehtê direvandin, geh di ber serê wî de dikir vizîni û derbas dibûn. Dawî dawî gulekê şewqê wî revand. Hingî çokên wî sist bûn û dest avêt serê xwe. Gava dît ku gule lêneketiye, hîn gavên xwe ramedan û xurttir bazda. Êdî kete çiyê û ji ber çavên leşkeran winda bû.

Gund di qûna çiyê de bû. Çiya ji ber awayê xwe ve asê bû. Kevir, gome, teht, dar, mar, dûpişk, kêzik, kurmik, hema çî li wî çiyayî hebûya, hemû dost bûn. Ew pir mêvanperwer bûn. Wan tu caran mêvanên xwe nedidan dest. Wan mêvanên xwe fedîkar dernedixist. Lawik hebki bi çiyê de bi jor ket, xwe avêt şikeftêkê û winda bû. Êdî çar-pênc kamyon tije leşker, hezar helîkopter û balafir jî bihata hew ew beşer didîtin. Çiyê tu caran ew beşer nedida dest wan. Çiya dost bû. Çiya ne weke wan xayin û bêbext bû. Leşkeran bi xwe bi vê zanîbûn. Ji ber vê yekê bi paş de li gund vegeyriyan.

Li gund ji leşkeran pê ve tu kes nedihatine xuyakirin. Kûçik çend caran bi dengên tivingên wan reya bûn, lê dû re ew jî winda bûbûn. Zarokên ku berî niha bi panzdeh deqîqan li dora gund dileyistin, her yekî xwe di derekê de veşartibû. Kal, pîr, jin û mêr dil bi tirs di hundirên xwe de difikirîn.

Leşker ketin nava gund û her yek çû ser xaniyekî. Dû re serçawîş û çend leşker çûn mala Muxtêr (keya).

Muxtar jî weke hemû gundiyan di hundir de dil bi tirs rawesta bû. Gava ku çawîş û leşker ketin hundir, muxtar ji cihê xwe rabû û cî da wan. Çawîş ber bi wî çû, xwe avêt milên wî, ew ber bi xwe kişand û bi hêz çoka xwe li gunê wî xist. Bi lêxistinê çawîş re, axîn bi muxtêr ket, destên xwe avêt nav lingên xwe û xwe bi ser hev de epîşand. Îcar çawîş çpka xwe li ser çavê wî xist. Muxtar li ser piştê li erdê ket. Jina wî û zarokên wî xwestin, ku xwe biavêjin ser wî, lê leşkeran nehişt û bi pehînan ew dane alî. Dû re bi emrê çawîş leşkeran bi milê muxtêr girtin û ew derxistin der. Ew birin qada (meydan, hol) gund û bi kindirê bi darê ve girê dan. Gava ku leşkeran girêka dawî li kindirê xist, çawîş pehînek li zikê wî xist û got :

- Tu ê tivingên gund bidî hev an na?

Muxtêr bi dengêkî nîvqurmiçî bersiv da :

- Min ji hemû gundiyan pirsîye, tu tiving li gund nema ye.

Çawîş sê-çar hutik û pehînen din jî li zikê wî xist û bi ser de qîriya :

- Tu ê sîlahên gund bidî hev an na?

Muxtar îcar nikanîbû bipeyiviya, du-sê Caran li ser hev kuxiya û vereşiya : Lê hemû verşiya wî bi ser wî de hat.

Çawîş tif kir ser çavên wî û got :

- Wisan bi ser xwe de verşe kero! Divê ku tu sîlahên gund bidî hev. An na tu ê wisan bi vê darê ve hişk bibî!

Muxtêr tu tişt negot. Verşiya dawî ku ji dev hat, wek verşiya zarokên çelîni bû, bi ser lêva wî de herikî.

Çawîş ber bi wî çû, hişk bi porî wî girt, serê wî hejand û got :

- Tu ê tivingên gund bidî hev an na?

Gava ku muxtar got :

- Tu tiving li gund nema ne.

Çawîş sê-çar şîmaqên bi hêz di ser çavên wî de lê xist û dîsan bi ser de qîriya :

- Tu nizanî haaa! Tu nizanî!.. û ew da ber kulm û pehînan.

Di wextek kurt de, hemû zilamên gund bi qûnên tivingan û bi qamçiyên li qada gund hatine civandin. Leşkeran bi lêdanê ew kirin rêz. Piştî ku her yekî çend qamçiyên baş li wan xistin, dû re çawîş bi tilya xwe muxtarê ku bi darê ve girêdayî bû, nîşanî wan da, bi hêrs bi ser wan de qîriya û got :

- Hun vî kûçikê ku bi darê ve girêdayî dibînin ne? Ku her kes sîlahên xwe neynin teslîm nekin, ez ê we hemûwan têxim vê rewşê û hîn ji vê rewşê xerabtir.

- Sîlahên me yên ku hebûn me teslîm kirin, tu sîlah li gund nema ne!

Ev deng ji nav rêza gundiyan hat, dengê zilamekî kal û bi rih bû. Çawîş bi wî dengî re li gundiyan zîvirî û bi hêrs got :

- Ew ê ku peyivî bila derkeve vir. (Bi destê xwe cih nîşan da).

Gava ku kes ji nav rêza gundiyan derneket, çawîş ji hêrsan bû weke dêhnan. Emrê lêdana gundiyan da leşkeran. Leşkeran bi pehînan û bi qûnê tivingên xwe gundî ji wê rewşê derxistin, kirin rewşeke din. Dîsan bi emrê çawîş leşkeran gundî weke berê kirin rêzê.

Çawîş ber bi muxtêr çû û serê xwe du-sê caran ber bi jêr ve hejand. Dû re ji nişkê ve piştî destê xwe yê çepê li ser çavên wî xist û got :

- Hun ê me bixapînin û derewan bikin haa! Hun ê ji ber sîlahan veşêrin!

Ji xwîna ku li ser çavên muxtêr hişk bûbû mirov ew nasnedikir. Bi wê şîmaqa çawîş xwîne di nav diranên wî de piqand. Gava ku muxtêr tif kir, hemû xwîn bû. Lê tifa wî negihîşt erdê. Ji ber ku hêz tê de nema bû û bêhêzî tif kir. Tifa wî bi zorê ji devê wî derket û di ser çenga wî de herikî ser sînga wî.

Çawîş dû re emir da du leşkeran, ji bo ku muxtêr ji darê vekin. Leşkeran zû zû girêkên kindirê vekirin û muxtar ji darê vekirin. Gava ku muxtar ji darê hate

vekirin, nikanî bû li ser lingên xwe rawestiya, du-sê caran hejiya û ket. Leşkeran bi herdu milên wî girtin, ji erdê rakirin û ew li ser lingan rawestandin. Dû re leşkerekî din satilek ava cemidî bi ser serê wî da kir. Bi wî awayî muxtar bi zorê li ser lingên xwe rawestiya.

Çawîş bi gavên giran ber bi wî çû, tiliya xwe ya girdikê da bin çenga wî, serê wî bilind kir, ziq li çavên wî nihêrî û bi hêrs got :

- Tu ê sîlahên gund bidî hev an na?

Ji lêdanê deng di muxtêr de nema bû. Bi zorê deng jê derket :

- Tu sîlah li gund nemane, tiştên ku hebû me teslîm kirine!

- Tiştên ku hebû we teslîm kirine? De zû kincên xwe ji xwe bike!

Muxtêr fêhm nekir bê çawîş çî got, di cihê xwe de bêdeng ma.

Îcar çawîş çoka xwe li gunê wî xist û bi ser de qîriya :

- Ez ji te re dibêjim, kincên xwe ji xwe bike!

Bi lêdana wî re muxtêr destên xwe avêt nav çîpên xwe. Wisan janê da dilê wî ku wextî bêhiş biketa. Dû re hêdî hêdî çakête xwe ji xwe kir.

Çawîş :

- Qutikê xwe jî ji xwe bike, divê ku tu tişt li te nemîne!

Muxtêr hêdî hêdî êleg û qutikê xwe jî ji xwe kir. Bi wî awayî ji navê bi jor de tazî ma. Pirça sînga wî ya spî ji xwîn û xwêdanê li hev geriya bû.

Çawîş destê xwe li ba kir û got :

- De, de! Ji xwe bike! Şalwar jî ji xwe bike! Divê ku tu tişt li te nemîne! Divê ku tu ,ût û tazî bimîne!

Muxtêr qonçên şalwarê xwe jî vekir û şalwar ji xwe kir. Derpiyê wî yê qut û spî lê ma. Dû re bi stûxwarî li çawîş nihêrî. Çawîş bi hêrs destê xwe ber bi derpiyê wî vekir û got :

- Wî jî ji xwe bike. Wî jî ji xwe bike! Min pêşî ji te re got "ku tu sîlahên gund nedî hev û neynî teslîm nekî, ez ê te weke kûçikan tazî bikim û te li nav gund bigerînim".

Muxtêr hêdî destên xwe avêt piziya derpiyê xwe û derpî jî ji xwe kir. Gava ku wî derpî ji xwe kir, hemû gundiyan ku li wir

bûbûn û pirça canê wî weke ya jîjo lê giş bûbû. Piştî ku hebki fikirî got :

- Tu xwe du rojan li me bigirî. Piştî du rojên din ez ê hemû tivingên gund bidim hev û bi destên xwe bînim ji we re.

Gava ku muxtêr wa got, hemû gundiyan bi şaşmayî li çavên hevdu nihêrîn. Şika hemûwan ji hevdu çê bû. Hinan di dilê xwe de gotin "ma qey muxtar dêhn e, ma ji ku sîlah di gund de mane".

Wê rojê heya bi êvarî leşkeran bi lêxistinê gundî ji wê rewşê derxistin, xistin rewşeke din. Li malê hemûyan yek bi yek geriyar. Tu qul di gund de nehiştin, ku lê negeriyar. Dawî, berî ku ji gund derkevin, dîsa çawîş ji muxtêr re got :

- Ger ku tu piştî du rojan hemû sîlahên gund neynî teslîm nekî, ez ê êgir bera gund bidim. Ez ê we hemûwan di ser hev de bişewitînim. Berî ku tarî têkeve erdê, hemû leşker li tirimpêlên xwe siwar bûn û ji gund derketin.

Evarî hemû zilamên gund li oda gund veheviyan. Hinan ji muxtêr pirsîn :

- Ma sîlahên me kê heye, ku te ji wan re got, ku tu ê piştî du rojên din sîlahan bibî teslîmî wan bikî?

Muxtêr serê xwe kil kir û bersiva wan da:

- Ez zanim ku tu sîlahên me kesî tune. Lê ramanek din hate min, ku em hinek pere di nav xwe de bidin hev û herin, hin tiving kevn ji çawîşê qereqola vî gundê cîranê me bikin û bibin teslîmî wan bikin. An na bêbavan dev ji me bernadin. Ew ê her roj bi vî awayî bigrin ser gund û namûsa me bînin perakî.

Çend peyayê rûspî peyva muxtêr di cih de dîtin û gotin :

- Law Welleh muxtar rast dibêje! Eskerên tirkan bêbav in, ew kanin êgir bi gundan xînin.

Yekî ji nav wan bi qûnkişkê ber bi pêş de kişiya, berê xwe bi civatê vekir û bi dilşewatî got :

- Lawo mi qey nayê bîra we, ku vana bi saxî kurd dixistin kîsan û diavêtin golan. Ku niha mirov li binê gola Wanê bigere, mirov dê bi hezaran miriyên Kurdan tê de bibîne. Ma qey nayê bîra we, ku agir bi gundan dixistin, terş, teba û mirov tevde dişewitandin. Dîsan li wan wisan hatiye. Ew dîsan har bûne û tiştên ku bixwazin kanin bi serên me

de bikin. Ma ka em ê bi vî awayê xwe çawan zora wan bibin? Em ê çawan bixînin lawo? Em kêmhêz in, kêmhêz ... Ji aliyê din jî em bi xwe-xwe kişiyane ber hev. Em bi xwe-xwe mala hevdu wêran dikin. Bila îro em yek biwana û em destek biwana, bila çend eskerên qûnbicilik li me wisan bikira. Bila wan em şût û tazî bikirana û jinên me li kolanên me siwar bikirana. Em Kurd xerab in, xerab ... Em dijminên hev in û ji hev re xurtin. Em wek kew û tajiye ne. Em dijminê qewmê xwe ne! Em xerab in, em bênamûs in!

Gava ku dipeyivî ji hêrsan temama canê wî dilerizî. Piştî ku cigarek vexist, dîsan peyva xwe domand :

- Wan îro em peya tazî kirin, dê sibe jinên me tazî bikin. Ew ê li ber çavên me dest biavêjin namûsên me!

Êdî hew peyivî. Herdu lêvên wî lerizî û çend dilop hêsir ji çavan hat. Ji cihê xwe rabû û çû li quncika herî dawiyê rûnişt..

Bi wî awayî hemû gundiyan a xwe kirin yek û di nav xwe de pere dane hev. Yên ku perên wan tunebûn, ji yên din deyn kirin. Sibehê zû muxtêr û du peyên din berê xwe dane qereqolê. Qereqol bi sê-çar kîlo-metreyan dûrî gundê wan bû. Gava ku gihiştin qereqolê, roj bi qamekê bilind bûbû.

Çawîş masak derxistibû hewşê, bin siya daran û rûniştibû taştê dixwar. Muxtar û herdu peya dageriyar hewşê. Gava ku çav li wan ket, wa bi devkenî got :

- Xêr e muxtar? Dîsan gundiyan li hev xistine?

Muxtar û herdu peya çûn cem. Li dor masa çawîş tenê du kursiyên vala hebûn. Muxtar û yek ji nav peyan li ser kursiyar rûniştin. Yê din jî li erdê, li ser giyê rûnişt.

Çawîş dîsan pirsî :

- De bêje, xêr e muxtar?

Muxtêr derdê xwe jê re got û ew perên ku ji nav gundiyan dabû hev danî ser masê.

Karê çawîş xûkîxwarin bû. Wî ji hemû gunden dorhêlê xûkî dixwar. Gava ku çav li wan peran ket çavên wî beloq bûn. Qederê deqîçekê ziq li wan peran nihêrî. Dû re dest û devê xwe bi destmala xwe ya kaxizî paqij kir û rahişt wan peran. Piştî ku hejmart, xiste bêrika xwe, rabû ser xwe

hatibûn civandin li çavên hevdu nihêrîn. Leşkerekî dîsan satilek av bi ser muxtêr da kir. Çawîş bi sê-çar gavan paş de çû û bi hêrs got :

- De! De xwe weke kûçikan dawşîne! Muxtêr xwe dawşand. Ava ku jê hat, weke dilopên baranê li ser gundiyan hate reşandin.

Dû re çawîş emir da du-sê leşkeran, ji bo ku jina muxtêr bînin. Leşkeran hema zû ji çawîş re silav dan û bi rev çûn jina muxtêr anîn.

Gava ku jinik di wê rewşê de çav li mêrê xwe ket, kir qîrîn, ji leşkeran re xeber da û xwest ku xwe biavêje ser mêrê xwe. Lê leşkeran hişk bi milê wê girtin û ew bi paş de kişandin. Dû re zor lêkirin, da li mêrê xwe siwar bibe. Hingî çend heb ji nav gundiyan ku li wir hatibûne civandin xwe li leşkeran rakişandin û nemirovaniya wan ji wan re gotin. Lê leşkeran, zû ew bi qûnên tivingan û bi pehnan dane rawestan.

Muxtêr bi stûxwarî ji jina xwe re got :

- Were keçê, were li stûyê min siwar be! Tişt nabe!

Jinikê mêrê xwe neşikand. Çû destê xwe li stûyê wî gerand û li piştê wî siwar bû.

Çawîş pehînek li jinikê xist û got :

- Wisa nabe! Wisa nabe! Divê ku tu li kolana wî siwar be.

Icar muxtar li ser tûtikan rûnişt û jina wî li kolana wî siwar bû.

Çawîş serê xwe ber bi jêr ve hejand û bi devkenî got :

- Ha wisan ha ... De du caran here heya bi dibistanê û vegere!

Muxtêr berê xwe bi dibistanê vekir û meşiya. Dibistan bi qederê sed metreyî dûrî wan bû. Camên wê şikestî û li ser dîwarê wê hemû hatibû xeritandin. Piştî ku muxtar du caran çû heya bi dibistanê û hat, vegeriya cem çawîş û jina xwe ji stûyê xwe daxist.

Çawîş destê xwe avêt pirça sînga wî, çend ta jê kişand û bi hêrs got :

- Tu ê tivingên gund bidî hev an na?

Muxtêr ji hêrsan dilerizî, çavên wî sor



û ji muxtêr re got :

- Ka hun bidin dû min!

Muxtar û herdu peyan dane dû çawîş. Herçar bi hev re ketin hundir embarekê. Embar weke şikeftêkê kevn bû. Hundirê wê cemidî û rewa girtî bû.

Çawîş çend heb tivingên kevn û xerabeyî, ku li gundan girtibû, ji sindoqekê derxist, xiste çewalekî û da destên muxtêr. Dû re destê xwe yê rastê li milê wî xist û bi devkenî got :

- Ku tiştêk ji te re lazim bû tewsîr meke, ez li ber te sekinî me!

Muxtêr di mana "erê" de serê xwe ber bi xwe ve hejand, rahişt çewêl avêt milê xwe û bi herdu peyan re derket ji der ve.

Wê êvarê dîsan gundiyan li oda gund civîn çêkirin. Hinan gotin "em ê van sîlahan bidin zarokan û bişînin. Ew biçûk in, dibe ku ew ji girtinê bifilitin". Hinan

gotin "na camêr, em ê çawan sîlahan bi zarokan re bişînin, ma kesî tiştên wisa dîtiye?". Hinan gotin "Ya herî baş ew e, ku em sîlahan bi kalan re bişînin".

Lê dikir nedikir li hev nedikirin. Wan nedixistin serên hev. Dawî dawî muxtêr xwe da ber teslîmkirina sîlahan.

Roja piştî wî sibehê zû muxtar ji xew rabû, çewalên sîlahan avêt nav milê xwe û ji gund derket. Di nîvê rê de, du leşkerên li hespan siwar li muxtêr rast hatin. Ew dane rawestan û bi hêrs jê re gotin :

- Zû çewalê xwe veke! Ew çi ye di çewalê te de ye?

Muxtêr çewal ji ser milê xwe danî û hêdî hêdî girêkên wî vekirin. Ji leşkeran tirê ku an titûn e, an jî malê qaçax e. Lê gava ku çav li sîlahan ketin şaş û ecêbmayî man. Hema zû herdu destên wî li paş wî kelepçe kirin û ew dane pêşiya xwe.

DÎROKA KURD Û KURDISTAN

- VII -

DERWÊŞ

S e d s a l a X V I

Fermana Padîşahê Osmanîyan, Yavuz Sultan Selîm, ku ji Idrîsê Bedlîsî re şandi bû(x)

"Dostê Siltanan û xwedyê Fazletan Mewlana Hekîm Hazretî Idrîs,

Haya we bera hebe ku nama we giha me. Rastî, û xebata we bi sêdaqet, ji ber hemî hêza (gayret) ku te pêşan da, fetha Diyarbêkrê û dardorê wê mimkin bû. Ji bo vê serketina we bera çavên te rohnî bin. Inşallah hûnê bibin xwedyê sebeb û şerefa fetha cihên din. Li vî derbarî, tenî ji we êmîn im.


Ji we re du hezar şûrên bi zêr neqîşandî, du hezar zêrê Frenkî, tilorî, samurek, (Vaşak) kurk, û wekî din (çuha) kurk û

diyariyên cihê, tevî tevbîrên pêwîst, ji bo bikaranîna wan di warê icarî de û ji bo ku ji leşker re bînan paykîrin, hatin rêkîrin. Inşallah ewê bê qeza bighin. Bi sihhet û selametê bikar bînin.

Li wilayetan, li sencaqên begên kurd ku ji me ra itaet dikin li gora iktidar û liyakata wan tayin bike.

Ji beglerbegê Diyarbêkrê û ku ji aliyê me qîmetê wî pîrr mezin e, Mehmetra (ahkam)a ji aliyê Nîşan-î Şerefê min hatiye imze kirin rêdikim. Wê pêşkeşî wî bikin. Her sencaq ku li wî dardorî ji

(x) Ev fermana Yavuz Sultan Selîm bo Idrîsê Bedlîsê, ji pirtûka Hoca Sadettin "Tactevarih", cild II, de, bi zîmanekî giran (Osmaniya kevn), di rûpel 322 de, bo tirkî hatiye wergerandin û me jî ji pirtûka Kurdistan Tarihi, Mehmet Emin Zeki, wergerand kurdî.



Diyarbakir - Pirek li ser Diclê (Wênekêş: Slom)
 Elisée RECLUS, Nouvelle Géographie Universelle, 1884

begekî re bê nasîn, û rewşa welayetan, adetên wan û laqabên began, navên wan, bi me bide nasîn. Nîşanên ku min ji began ra rêkirin pêşkêş bike.

Ismaîlê kurê Erdebîl (xx), du elçî (qasid), Huseyin Beg û Bahram Axa, şandiyê. Ew dibêjin ku Ismaîl itaeta min dike û her emrê ku ez bidim tîne cih. Min ji wan bawer ne kir û her du avêtin zindanê.

Lewra, bawerî bi soza Ismaîl nabe. Tu jî di hemberê wî de şiyar be û ji kazkazên wî bawer meke".

Darulhilafet
 Edirne

Şêx Idrîs, 11 sencaq ji 19 sencaqên Diyarbekrê teslîmê emrê karbidestên Osmaniyan kiri bû. 8 sencaqên din jî girêdayî Osmaniyan bûn, lê, xwedmuxtariya wan (otonomî) hebû.

Cidayê vê yekê, li vê navçê 5 hikûmetên girêdayî siltan saz bû bûn. Ew li bajarên Palo, Egil, Cizre, Hazro û Genc bûn.

Ev hikûmet, di warê karên nav xwe de bi temamî azad bûn. Ji serekên wan re "Mîrê Mîran" dihat gotin.

Li dardorê Wanê jî ev sîstem dihat bi-kar anîn :

- 1- Hikûmeta Hekarî : xwedyê 10.000 çekdar bû.
- 2- Hikûmeta Bedlîsê : xwedyê nêzîkê 20.000 çekdar bû.
- 3- Hikûmeta Mahmûdî : ji yekbûna 120 êlên Kurdan pêk hati bû. 6.000 çekdar hebûn.
- 4- Hikûmeta Panîyaniş: Hêza vê hikûmetê jî weke ya hikûmeta Mahmûdiyan hebû.

Ewliya Çelebî di pirtûka xwe de, cild IX, rûpel 178, li cem van hikûmetên jor qala pênc hikûmetên din dike. Ev hikûmet, Kutur, Pireduzî, Cevlanî, Demdemî û Denbulî ne.

Weka li jor tê xuya kirin, emnaya Siltanê Osmaniyan li Idrîsê Bedlîsê heye. Siltan jê re kaxezên vala, lê ji aliyê wî îmzekirî, ji Idrîsê Bedlîsê re di-şiyandin û digot "Di cihê min de ji derên pêwîst re weka ku fermana min e bi kar bîne".

Şêx Idrîsê Bedlîsê di navbera Kurdandê -demeke bê şerr derbas kir. Wî di vê dewrê de ne hişt ku di navbera Kurdan û Osmaniyan de şerr û nexweşî çêbibin. Wî di vê

(xx) Yavuz Selîm bi vî navî Şah Ismaîl qest dike û wî bi vî awayî biçûk dide xuya kirin.

dewra xwe da Kurdan "baş idare" kirin. Osmaniyan ji wî kar dikir. Wî ji wan re netewekî ku nîrê biyaniyan qet qebûl ne dikir bêdeng kir.

S e d s a l a X V I I

S e r h i l d a n a C a n p o l a d

Malbata Canpolad, li Kilîsê malbateke pîr kevn e. Ev malbat idara vê navçe dikir.

Di dema Cagalazade Sînan Paşa de, mîrê vê navçe ji Canpoladan Huseyin bû. Mîr Huseyin, di eynî demê de, ji aliyê Sadrazam ve bû bû beglerbegê Eyaleta Halebê.

Dema Sadrazam bi leşkerê xwe ra çû şerrê Îranê, xwest ku mîr Huseyin jî bi leşkerê xwe ra arîkarina wî bike. Mîr Huseyin ev daxwaz qebûl ne kir. Ji ber vê yekê Sadrazam di dema veqerê xwe da li Kilîsê ew da kuştin.

Li ser vê yekê birê mîr Huseyin, mîr Elî çû Halebê û di hemberê Osmaniyan de ser hilda. Ji Halebê êrîş bir ser Trab-lusşamê û ev der îşgal kir. Paş ku hêza wî baş mezin bû û navê wî hat nasîn, bi serê xwe hereket kir. Di mizgeftan de (camî) xutbe bi navê xwe dan xwendin.

Mîr Elî, di sala 1607 de, li Îtalya, bi Arşîdukê hikûmeta Toskana, Fernand, re levhatin çêkir û bi hikûmetên din ra li Anadolê dostanî girêda. Ev bûyerên ha karbidestên Osmaniyan ditirsandin. Di vê demê da jî serhildanên Celaliyan dest pê kiri bûn. Osmaniyan dixwest van serhildanan bişkînin. Sadrazamê wê demê, Kuyucu Murat Paşa, berê xwe da bû serhildana Celaliyan, lê gava dît ku mîr Elî hêza xwe mezintir dike, leşkerê xwe ber bi navça mîr Elî de ajot.

Mîr Elî haziriya şerr kir û bi hêza xwe ra li dardorê Bograz ket rewşa şerr. 20.000 siwar û hewqas jî leşkerê piyade ev hêz teşkîl dikir.

Leşkerê Murat Paşa jî giş hêza Osmaniyan bû û li cem vê yekê jî nêzîkê 40.000

leşkerê kurd ji Kurdên Dulkadir (x) bi Osmaniyan re êrîş bir ser hêza mîr Elî. Dema hêza Murat Paşa giha nêzîkê hêza mîr Elî, dît ku ev navçe ji bo wî ne baş bû û wê hêza wî di hember ya mîr Elî da bişkiya. Hînga hemî hêza xwe veqerand û berê xwe da boxaza Aslan Belî û ji wira leşkerê mîr Eliyê Canpoladî xist çemberê. Di heyva Hezîranê da êrîşên pîr giran çêbûn. Di vî şerrî da nivî ji leşkerê mîr Elî hat kuştin. Mîr Elî dît ku wê pîr xesara wî bibe. Hînga berê xwe da Halebê. Leşkerê Osmaniyan li wira jî êrîş birin ser mîr Elî. Paş talanên mezin ku xelk pê pîr diêşiya, mîr Elî biryara rawestandina şerr kir û çû Stembolê ku efuya xwe ji siltanê Osmaniyan, Siltan Ahmed I. bixwaze. Siltanê Osmaniyan ew efu kir û li cem vê yekê jî ew kir beglerbegê Temavşar. Birê wî yê biçûk jî anî medresa Sarayê. Ev qedr û qîmetê ku siltanê Osmaniyan ji mîr Elî re girt ji Murat Paşa re ne xweş hat û ji ber vê yekê jî meriv şandin keliha Belgrad ku mîr Elî li wira bikujin.

Dûmahî heye

(x) Li gora Tarîxa Ibnî Werdî, eslê Dulkadir Tirkmen bû, li navça Maraşê, ev belgika wî girêdayî dewleta Memlûk bû ku weka emirlikekê din bin idara dewleta Misirê bû. Osmaniyan vê emirlikekê li wê navçe, di sala 1521 de, xera kiri bû.

İSMAİL BEŞİKÇİ TEHLİKEDEDİR

Kürt avukat Şerafettin Kaya, Dr. İsmail Beşikçi'nin cezaevinde çok kötü şartlarda bulunduğunu ve ağır baskı gördüğünü açıklayan bir bildiri yayınladı.

Şerafettin Kaya, bildiri de Beşikçi'nin gördüğü işkenceleri anlatıyor ve uluslararası kamuoyunu Türkiye Cumhuriyeti hükümetini protestoya çağırıyor.

Bu arada Dengê Komal da, İsmail Beşikçi ve Komal Yayınevi sorumlu Yazı İşlerimüdürü Recep Maraşlı'ya yapılan ağır işkenceleri protesto eden bir imza kampanyasını açmış bulunuyor.

Bilindiği gibi, gerek sosyolog ve yazar İsmail Beşikçi ve gerekse Recep Maraşlı'nın milliyetleri türk olmasına rağmen her ikisi de Kürt halkının demokratik hakları için mücadele etmektedirler. Yalanlara açıkça karşı çıkıp bilimsel gerçeği savunmaktadırlar. En ağır işkencelere direnerek fikirlerinden ödün vermemekte, mücadeleyi sürdürmektedirler.

Bu protestolara biz de katılıyor, zulüm ve işkenceye karşı olan tüm demokratları ve barışseverleri İsmail Beşikçi ve Recep Maraşlı'nın yaşam özgürlüğünü korumak için dayanışmaya davet ediyoruz.

Beşikçi ve Maraşlı'ya yapılan işkencelerin son bulması için Avrupa kamuoyundaki güçler harekete geçirilmeli, imza kampanyaları, basına duyuru çalışmaları yapılmalı ve baskılar Türkiye Cumhuriyeti'nin Başbakanlığı ve Adalet Bakanlığı nezdinde protesto edilmelidir.

Biz, Belçika'da bu yöndeki çalışmalarını başlattık ve imza kampanyasının yanısıra konunun Belçikalı iki Flaman üye aracılığı ile Avrupa Parlametosu'na ve bir Flaman üye aracılığıyla Belçika Meclisine ulaştırılmasını sağladık. Gelen ilk haberlere göre her iki parlametoda da olumlu gelişmeler vardır.

İsmail Beşikçi'nin daha önce işkence odalarında öldürülen aydın, bilim adamı ve yurtseverlerin akıbetine uğratılmasına izin vermeyelim, Beşikçi ve Maraşlı'yı ölüm tehlikesinden kurtarmak için demokrasi güçleri görev başına!

Kendisi de uzun süre Diyarbakır zindanlarında baskı gören ve işkenceleri "Diyarbakır'da İşkence" adlı bir kitapta kamuoyuna açıklayan Avukat Şerafettin Kaya'nın konuyla ilgili bildirisini ve Beşikçi ile Maraşlı için başlatılan kampanyanın metnini aşağıda yayınlıyoruz:

İSMAİL BEŞİKÇİ TEHLİKEDEDİR


"Kürt halkının sosyo-ekonomik yapısını inceleyen, Kürt aşiretleriyle ilgili inceleme yapan ve bu çalışmalarıyla yar-

gılanan sayın İ. Beşikçi hayatı tehlike - dedir.

"Gölcük cezaevinden Çanakkale cezaevine gönderilen ve orada uzun süre tek hücrede tutulan Beşikçi mahkemedeki savunmasını geri alması ve resmi ideoloji doğrultusunda taviz vermesi, Kürt ulusuyla ilgili yazdıklarını yalanlamak için zorlanmış ve baskı altında tutulmuştu.

"Uluslararası Af Örgütü'nün, Avrupa Demokratik kamuoyunun, yazarların ve Kilise mensuplarının müdahale ve pretostaları ile baskı kısmen zayıflamıştı. Ancak dört ay kadar bir zaman sonra ortada hiçbir neden yokken, hiçbir yasal gerekçe gösterilmeden, İ. Beşikçi Gaziantep Cezaevi'ne koşularak sürgün edildi. Bölgenin en kötü koşullarına sahip olan bu cezaevinde Beşikçi'nin sağlığı iyice bozulmuştur. Yemek kapı altındaki delikten verilmektedir. Hiç havalandırılmamaktadır. Okuma-yazma yasağıdır. Diğer tutuklularla ilişkisine müsaade edilmediği gibi ailesi ve avukatının dışında kimseyle görüştürülmektedir. Bu görüşmeler de ancak çok kısa ve kontrol altına gerçekleştirilmektedir. Af Örgütü, Dünya ve Avrupa Yazarlar Birliği, Uluslararası ve Avrupa basın kuruluşları,

Devami s. 27



KURDISTAN, ÇEND ABORÎ Û

Kurdistan a Iranê

AQAR : 125.000 km² (7,6% ji erdê Iranê).

Dewlemendî

DARISTAN : ew çiyayî dinixumînin (ji 4 milyon hêktar bêtir).

BINERD : dewlemend e, lê bi kar ne hatiye. Petrol li navçeya Kermansahê tê derxistin. Hikûmeta Iranê û şirketên petroliyên pirnetewî (multinational) li wira ji milyonek ton kêmtir derdixin. Ew jî bitenê ji bo pêwistiya navçê ye.

Gelhe

6 milyon (17% ji gelha Iranê). Li Iranê, di bin hikmê Şah de, ji sedema pêşveçûna

sistema kapitalîst, paykiriyeke piçûk a erdê û berdana gundan ji aliyê kitleyan gundiyan ku çûn bajaran, di civaka kurdî de hin guhartinên civakî, aborî û çandî çêbûn. Ew nema civakeke bicarekê êlî (eşîrî) ye.

Iro, li Kurdistan a Iranê, ji 7.500 gund bêtir hene (di gundekî ne pirr mezîna de 50-100 malî hene). Li gora jimartinan (statistik), ji gelha gundî ji 95% bêtir bicihbûyî ne (ne koçerin). Di destpêka vê sedsalê de, erdê ku ji berê mîr dida êlê, ji aliyê serokên êlan ku bû bûn fêodal dihat stendin.

Berê paykirina erd, rewşa gundên kurdî li gora tabloya jêrîn bû:

Ç î n	% gelha gundî		Erdên ku, bi hêktar, hebûna her malî ne
	1960	texmînên 1975	
Axayên mezîna	0,3	-	Ji 300 bêtir
Axayên navîn	0,6	0,8	30 - 50
Axayên piçûk	1,5	2,5	5 - 20
Gundiyan navîn	3	32	1 - 3
Gundiyan bêerd	72	24-26	-
Karkerên ziraî	10	23-26	-
Çînen din	12,6	14,7	-

Sinaet

Ji dehan şirketên sinayîyan mezîna ên Iranê, yek jî li Kurdistanê tu neye. Bitenê, riyeke trênan a stratêjîk ku Iranê girêdide Tirkîyê heye. Bitenê erdekî ziftkirî û stratêjîk di dirêjayiya sînorên Iraqê de, ji bo girêdana Kurdistan a Başûr û Bakur, tê çêkirin. Ziraet ji karê netewî 80% tîne. Sewiyeta jînê li Kurdistanê pirr nizm e. Li gora jimartinan 1966, maliyên 5-6 kesî ku di odekê

tênê de rûdiniştin ji 50% bûn. Piraniya xaniyan bê ava paqij û bê elektrîk in. Li bajaran, seetên xebatê di heftê de ji 54 bêtir in. Sedema bilindbûna pareke mezîna ji karê netewî derxistina petrolê ya mezîna û, di salên dawîn de, bilindbûna giring a buhayê petrolê ye. Lê, Kurdistan a Iranê, ji van milyaran tu kar nake. Heta demê nêzîk, Kurdistan a Iranê girêdayî (di bin) abora Iranê bû, lê di salên dawîn de, ew bû perçeke giştî ji abora Iranê.

NOT LI SER JÎNA

ÇANDÎ -IV-

PERVIN

Li gel guhartinên ku sistema kapîtalîst ji Iranê re anî, ew welatekî paşdemayî dimîne. Lê Kurdîstana Iranê ji perçeyên wê yê paşdemayîtirîn e.

Kurdîstana Iraqê

AQAR: 74.000 km² (17% ji erdê Iraqê)

GELHE: 4 milyon (28% ji gelha Iraqê). Pîrbûna (kesafet) gelhê di km² de 39,4 e. Lê, li Iraqa erebî ku pîraniya wê çol e, ev pîrbûn 22,2 ye.

Dewlemendî

ÇIYA: ew erdekî çiyayiyekî nîvdaristanî ye û di awayê (şiklê) kevanekê ye. Serê wî yê bilintirîn Hazar-Rost e (3.727 m.). Ew, di çiyayê Halgurd de, riya stratêjîk ku navê wê kirine riya Hamilton, nêzîkî sînora Iranê, hikim dike. Ew rê, di salên şerrên dawîn de, dijî hikûmeta Iraqê, ji bo pêşmergan çara derbasbûnê ya sereke (bitenê) bû.

DEŞTEN DEWLEMEND: ên Erbîlê (embara navçeya kurdî ku ji demên kevnar de hatiye nêşîn), Harîrê, Şahrezorê û Kerkûkê. Ev deşt ji deştên Mêzopotamya Nizm, bi zîncîra çiyayê Hamrînê ya bejî, ne pîrr bilind û ku sînoreke tebîî di nav bera welatên kurdî û erebî ava dike, hatine veqetandin.

Ç E M: Dicle, Zabê Mezin, Zabê Piçûk, Di-yala yan Sirwan.

MADDEN ZIRAI: weka li perçên din ên Kurdîstanê: tutun, zad, dar, mêw (darên tirî), meywe (fêkî), çerm, hirî, goştê mi-

yan û bizinan, maddên ku ji şîr çêdibin (penîr, mast

PETROL: ew dewlemendiya mezintirîn a welêt e (li navçeyên Kerkûk û Mûsilê), lê gelê kurd jê kar nake.

BINERD: hesin û krom, lê ew bi kar ne bûne.

Damezrana civakî

Ji gelhê 50% gundî ne. Koçerên rast nema hene. Hin êlên nîv-koçer hene (ji gelhê 0,5%).

Bajarên giringtirîn ev in:

KERKOK: 250.000 rûniştevan, di nivê navçeya petrolê de.

SILEYMANIYE: 160.000 rûniştevan; navçeyeke ziraiyeke fireh e. Ew roleke çandîyeke pîrr giring dilîze. Ew xwediyê zanîngeheke kurdî ye.

ERBIL: 160.000 rûniştevan. Rolê wê çandî û aborî ye: ticaret û sinaeta sivik.

Çend bajarên ku tê de nêzîkî 50.000 rûniştevan hene: KOY-SANCAK, XANAQIN û KERMANŞAH.

Jimarek mezin ji bajarên piçûk ku tê de 10-15.000 kes rûdinên heye.

Kurdîstana Sûriyê

Aqar: 3 navçe

a) **Çiyayê Kurdan:** li Rojavaya Bakurê, bajarê Helebê (Rojavaya Bakurê Sûriyê), nêzîkî deşta Antakyê û Iskenderonê. Gelha wî pîrr e: 360 gundên şîn. Dewlemendiyên wî ev in: zad, mêw, spîndar, darên hijr, tû, berû û zeytûn.

b) **BAKURÊ HELEBÊ:** bi erebî navê wê navçeyê kirine Ain-El-Arab (Kaniya Ereban), nêzîkî çemê Feratê: 120 gund.

c) **CEZIRE:** li Rojhilata Bakurê Sûriyê. Ew deşteke fireh e û li Kurdîstana Sûriyê navçeya giringtirîn e.

Gelhe

800.000 (11% ji gelha Sûriyê). Di dema osmanî de (sedsalên 16-19), tê de êlên kurdên nîv-koçer, xwedîkerên pez, û koçerên ereb, xwedîkerên mezin ên devan, dijiyan.

Ji 1920 û şûn de, êlên kurd, bi hatina gundiyan çiyayî û bajariyan ku ji Kurdistanê Tirkîyê, piştî şikestina tevgerên dijî Ata-Türk, reviya bûn, xurt bûn. Ew bi cih bûn û li navçeya Cezîrê rawestan. Di çend deh salan de, Cezîre bû embara Sûriyê ya yekemîn.

Bi awakî giştî, Kurdên Sûriyê gundî ne: xwedîkirina pez û bizin, çêkirina maddên

şîrî û qumaş Li çiyayê Kurdan, zeytê zeytûn û komirê daran ji Helebê re tên firotin. Bajarî, ji Kurdan 20%, ji ticarêta piçûk û hunera dest dijîn.

BAJAR: Li Kurdistanê Sûriyê şeş bajarên piçûk ku çar ji wan li Cezîrê ne hene:

QAMIŞLÎ: 40.000 rûniştevan.

AMODE: 15.000

DERBASÎYE: 15.000

Her sê jî nêzikî sînora tirkî ne.

DÊRÎK: 6.000, nêzikî sînora Iraqê.

EIN-EL-ARAB: 8.000, navenda navçeya ku eynî navî stendiye.

EFRÎN: 20.000, navenda çiyayê Kurdan.

Kurdên Sovyêtîstanê

Gelhe: 300.000

ERMENISTAN: Ji Kurdan 1/3 li Erivanê, paytexta Ermenistana Sovyêtî, rûdinên. En mayîn li 22 gundên navçeya kurdî ya Alagez û Talîn, û li gundên tevlihev (kurdî-azerî), yan jî, kêmtir, li gundên kurdî-ermenî rûdinên.

GURCISTAN: Kurd li wira, bi hêzanî li Tîblîsê, li "mehella kurdî" ya bajarê, rûdinên.

AZERBAIJAN: Nêzikî 50 gund û bajarên piçûkên kurdî hene. Heta dawiya salên 30, ew bitenê bi Kurdan tije bûn. Îro, gelha wan ji aliyê etnîkî tevlihev e, ji bo ku şovînzîma tirkê-mezin li ba Azerîyan û rêzana asimilasyonê (misilman, ango azerî), di sala 1929 de, bûn sedema hilweşana komara Kurdistanê otonom ku di 1923 de, li ser erdên Latşîn, Kelbajar û Naxşivan, ava bû bû. (A. BUKŞ, Azerbaïcan-skije Kurdy "Kurdên Azerî", Bakû, 1932, rûpel 8).

TIRKMEANISTAN: Ev komareke sovyêtî, tirkî û misilman e. Rêzana şoven a berpirsiyarên tirkmen nahêle ku şexsiyeta kurdî xwe nîşan bike. Nîşe: ji aliyê idarî, Kurd, di defterên belediyan de, weka Azerî tên qeyd kirin. Kurd li paytextê, Aşxabad, û li bajarên din bi cih bûne.

KAZAKSTAN Û KIRGIZYA: Di van her du welatên nîv-çol de, Kurd li çend navçeyên çiyayî jî bijartin û ew li wira bi xwedîkirina lawiran mijûr dibin.

BIBLIOGRAFI

CHALIAND G., Les Kurdes et le Kurdistan (Kendal, A. R. Qasimlo, Archie Roosevelt, I. Ş. Vanly, Mustafa Nazdar), Maspéro, 1978.

CHALIAND G., Poésie Populaire des Turcs et des Kurdes, Edit. d'Aujourd'hui, 2e tirage, 1978.

BLAU Joyce, Le Problème Kurde. Essai sociologique et historique, Ed. le Monde musulman contemporain, Bruxelles, 1963.

BOIS Thomas, L'âme kurde à la lumière de leur folklore Beyrut, 1946.



Dawî

ROLA ROJNAME Û KOVARAN

Dr. POLOÇO

Berî niha bi çendakî, piştî ku min ji hin pirtûkan hin not girtin, tiştêkî welê hate hişê min, ku ez çav biavêjim hemû pirtûk, rojname û kovarên kurdî. Min rabû hemî tiştên xwe yê bi kurdî ji refan daxistin û ew li orta xaniyê malê kire kom. Erê, bi rastî jî komeke mezin çêbûbû. Dû re weke ku gundiyeke kurd, çelê zivistanê li ber şorbê çarmêrkî vedide, min li ber, wê koma nivîsên kurdî çarmêrkî veda û ez bi xwendina wan ve mijûl bûm. Min pêşî dest bi pirtûkan kir. Pirtûkên helbestan min heryekî çend helbest ji wan xwendin. Ji xwe yê roman û çîrokan di nava koma weşanên li ber min, kêmbûn. Yê ku hebûn jî min her yekî rûpelek du rûpel jê xwendin. Ji xwe gava ku weşanên kurdî dikevine destên min ne carekê, ez wan du-sê caran dixwînim, yê ku li gorî nêrîna min çewtî û kêmasî di wan de hebin, ez binê wan xêz dikim. Yê ku gotinên kurdî, yê neçêkirî tê de hebin û min nebihîstibin, ez li ba xwe di defterekê de dinivîsim.

Piştî ku min ew pirtûk di çav re derbas kirin, ez dageriyam ser kovaran. Min li jor behsa rojnameyên kiriye, lê mixabin rojnameyên rojane min qet nedît. Min ji berhevoka kovara Hawarê dest pêkir. Min pir helbest, kurteçîrok, werger, nûçe û şîretên xweş tê de dît. Piştî ku min baş kovara Hawarê di ser hev re qulipand, ez dageriyam ser kovara Tîrêjê. Min li hejmarên Tîrêjê jî yek bi yek nihêrî. Di wê de jî dîsan pir nivîsên xweş di bin navên cihê-cihê de tê de hebûn û her hejmarek ji ya din xweştir bû. Dû re ez dageriyam ser Roja Nû, Têkoşer, Çiya û hwd... Guhertinên Têkoşer û Roja Nû ez kêfxweş kirim. Berê weke hin kovarê kurdî yê niha, tenê navên wan bi kurdî bûn lê naveroka wan bi tirkî bûn. Piştî ku min li kovara Hêvî, ya Instituya kurdî ya Parisê û kovarên bi kurdî yê zarokan jî mêze kir, dora Berbangê hat. Min Berbang ji hejmarê yekê heya bi ya dawî di çav re derbas kir û ez li navên pir nivîskaran rast hatim. Pirên nivîskarên wê ku ez bi şexsî nas dikim û danûstandinên me bi hev re hene, lê yê ku ez bi şexsî nas nakim jî pir nivîsên xweş tê de nivîsbûn. Tiştê ku bala min kişand, ku her nivîsek wan nivîskaran derdiket ji nivîsên wan yê kevin xweştir bû û guhertinek tê de hebû. Ya ku herî pir bala min ki-

şand pîrbûna navên nivîskaran bû. Min kir ku ez dest bavêjim hin kovarên din, maliya min derî vekir û ji min pirsî :

- Ma heya bi kengî tuê van pirtûk û kaxizan di ser hev re biqulupîni, ma qey tu şîvê naxwî?

- Çii?... Ma wextê şîvê ye?

- Ma tu li saetê nanihêrî bê saet çî ye?

.....

- Weleh ku niha pênc-şeş kovarên kurdî û çend rojnameyên kurdî yê rojane bihatina der, wê nivîskarên mezin ji nava Kurdan derbiketina û wanê karîbûna qayiş bi nivîskarên we Swêdiyan re bikişanda. Bi a min kovar û rojname ji bo derxistin û pêşdexistina nivîskaran roleke mezin dileyize.

Bi rastî jî wa ye. Ku niha hin kovarên kurdî li ser hev derbikevin û hin rojnameyên rojane hebin, wê hem nivîskar, hem jî rexnegirên hêja ji nav me Kurdan derbikevin. Ji ber vê yekê divê ku em guh bidin rojname û kovarên kurdî û em bi dilpaqijî û bi dostanî kovarên hîn xweştir, hîn firehtir û hêjatir bi hev re derbixînin û em bi alîkariya wan nivîskarên nemir bigihînin.



COGRAFYA KURDISTANÊ

DI ANSÎKLOPÊDIYA ÎSLAMÊ DE (*)

- || -

3- Aliyê mirovî

Ev navçeya ku Kurd îro tê de ne, ji demên kevnan de mirov tê de bi cih bûye. Bi vî awayî, Berda Balka, şkefta Hezar Merd a dema Mûstirî, ne dûrî Sileymaniyê, yan a Şanîdar, nêzikî Rawandûzê, ku tê de heykela yekemîn a insanê Palêolîtîk li Iraqê hat dîtin, hene. Tê gotin ku Jarmo, di geliya Çamçalê de, kevntirînê gundên Rojhilata Navîn e, ji bo ku ew belkî yek ji navendên ku tê de insan cara yekemîn celebên cihê yê genim û ceh çandi bû, li gora kolanên ekîpeke lêgerên zanîngeha Chicago (R. J. Braidwood, Bruce Hove, ... Prehistoric investigation in Iraqî Kurdistan, Chicago, 1961). Îro, Kurd di hemî welêt de bi cih bûye û tê de gelek gundan ava kiriye.

Kon

Di destpêkê de, wî bitenê warên tebîiyên bêjimar vergirtin. Ev war di bin zinaran de bûn û şkeftên bêjimar ku hin ji wan asê ne, pîr xweşik in, tê de dilopên qeşa awayên pîr ecêb stendine (stalagmît û stalaktît) (Edmonds, rûpel 235), û carna di bin çiyê de bi awakî kûr xwe dirêj dikin. Ev şkeft her dem ji bo war- kirina keriyên bi kêr tînin, lê carna meriv hîn jî rastî hin gundiyan ku tê de rûdinên dibê. Gelek efsane li ser hin ji van şkeftan digerin û dibêjin ku tê de saman (serwet) hatine veşartin û cin û ifrît jê derbas dibin (Edmonds, rûpel 206-7, 246, 332, 368-9; Hamilton, Ch. XIV-XV). Bi taybetî, Kurdên koçer ên ku dikin hunda bibin û ên nîv-koçer di bin kona xwe ya reş ku meriv nikare bi kona Erebe bedewî, bi kibitka Mongolan, xûrta Samoyêdan yan kota Laponan tevlihev bike (C. G. Feilberg, La Tente Noire, Copenhagen 1944, 81-6; Bischof I, rûpel 373; Lescot, 144-5; KHAYMA), rûdinên. Ev kon ji merşeke mezin ku tê de xêzên ku bi firehiya 50-60 cm. ji mûyê bizinan hatine raçandin ava bûye. Stûnên stûr ku wê digrin di bilindiya 2,50-3 m. de ne; jimara wan li gora mezinbûna konê ye, angû, li gora

giringiya xwediyê wê ne. Di serê wê de beşt tu neye. Perdên ji şiv quncika jinan û xezînan ji aliyê ku tê de zîlam û mêvan rûdinên vediqetînin. Dezgeha (mobîlya) wê bitenê çend hesîr û balîf e û li ba serokan xalîçe ye.

Xanî

Lê gundiya kurd li xaniyên ku ji maddên hişk ava bûne rûdinê. Ev madde, li deştan, hergav kerpîçên nepijandî yan, weka li Sileymaniyê, ên pijandî, ne, û yan jî, li çiyên, kevirên ku bi heriyê hatine gihandin. Bilindbûna dîwaran 2-2,50 m. ye. Di dîwarên ji kevirên xam de. carna beştên stûr hatine danîn ji bo ku ew dîwar xurtir bibin. Li hundir, di dîwaran de, cihne vala hatine çêkirin ji bo ku ew weka dolabekê bi kêr bînin. Dîwar bi heriya tevî ka hatine nixumandin, yan bi kils hatine sipî kirin. Derî ji darê stûr e. Pacên ber bi derve nînin, lê ber bi hewşê ne û bi darên ziravên hesinî (dirabe) ne, ji bo ku malê biparêzin. Gava ku meriv nikare derî vekirî bihêle, pacên piçûkên besît odê ronî dikin. Erd ji heriya hişk e. Di nîvê odê de, di zivistanê de, tenûrek (tendûr) bi "kursî" heye. Ev "kursî" çarçevêk ji dar û bi dev (qapax) e. Di bin qapaxê de hemî malî, li navçeyên sartirîn, xwe germ dike. Qulikek di esrex (aqr) de dîyê dikişîne. Di dirêjahiya dîwaran de, dikek fireh û ji heriya hişk heye. Li ser wê meriv, bi roj, rûdinê, û bi şev, li ser hesîran, kulavan yan livînan, radikeve. Serxanî ji gişlên spîndaran hatiye ava kirin. Ev gişl 50 cm ji hev dûr in û bi şax, pe., gihayên hişk û heriya hişk û stûr hatine girtin. Eger ode pîr fireh be (ji 3 m. bêtir), dar bi beştan digrin. Ji bo ajotina avan, serxanî ji dîwarên ku wî digirin firehtir dibê, yan jî, weka li Sileymaniyê, boriyên 1 m. herikandina ava baranê hêsan dikin. Jixwe, hergav, gindorek (bangêr) li serxanî heye, ji bo rastkirina heriyê, piştî baranên xurt. Meriv bi pêpaskekê

(*) Encyclopédie de l'Islam, rûpel 446-450, Parîs 1981. Wergerandin: fransizî-kurdî: Pervîn.

(derence) hildikişe jor. Xaniyê deştan ku tê de cih ne kême, ji hewşekê, maleke navendî ku ji oda rûniştinê ku bi quncikeke lawiran dirêj dibe, ava bûye. Maleke din, girêdayî wê, lê xurt, ji bo çêkirina xwarinê û danîna hûrûmûrên malê û aletên cot bi kêr tê. Tê de ne binerd, ne embar, û pirr caran, ne destav, heye. Di xaniyên çiyayî de, axur û odên girêdayî wan pirr caran di hewşê de ne. Oda rûniştinê li jor e, tevî quncikeke piçûk ji bo hilanîna xwarin. Pirr caran jî balkoneke girtî, ber bi Başûrê, heye. Serxani cihê xweştirîn ê jinan e. Ew li wira karên xweyên malê yên cihê dikin. (Ji bo wesf, plan, foto yan wêneyên xaniyên Kurdên cihê: En Djazira, R. Montagne, rûpel 53-66; au Sindjar, R. Lescot, 146-7; à Sulaymani, C.J. Edmonds, 90-3; à Sulaymani encore et aux villages de Topzaya et Belkha, H. H. Hansen, 21-43; au Kurdistan Iranien, Bishop, I, 88, II, 191, M. Mokri, 89-91. Leach, 49; T.F. Aristova, 95, 97, 99 pour la Transcaucasie).

Gund

Bi taybetî, meriv di mala xwe de bitenê najî. Ew tevî kom dijî. Ji bo vê yekê, gund hatin çêkirin û Kurd, merivê erd, li gund, ji bajar bêtir, dijî. Weka hemî gundên dinyayê, bi hêzanî li welatên çiyayî, cihê wan li gora tav, av, çem û kanî, hatiye bijartin. Bi vî awayî, divê

ku ruyê wî ber bi tavê be û di eynî zemanî de dûrî bayê be, ango di dirêjayiya mihwera zincîrên çiyar be. Gund, pêwist e ji Bakurê dûr be. Başûr, berê Mekkê, ji Rojhilatê bêtir tê hez kirin (Mokrî, 81). Giringiya gundan girêdayî nêzîkbûna cihên derbasbûnê (gelî, pir), têrkirina erdên çandinê û hebûna zozanan e. Gelek gund bi awayê pêpaskekê (derence) hatine ava kirin. Serxaniyên malên bilind dibin beniyên malên nizmtir. Ev awa li hemî navçeyên Kurdistanê tê dîtin. Nîşe: Li Akra, Barzincan, Şarî Hawraman. Ne kême caran meriv li serê çiyakî, nêzîkî xerabên keleke kevn, bermayiya serfiraziya buhurî ya axakî ku ji sedsalan de hunda bûye, dibîne. Bi awayê xwe, gundê kurdî şîrîn û cazib e, ji sedema avê, bexçan û daran.

Gundên kurdî, li gora bilindbûna navçeyê, ji hev nêzîktir yan dûrtir in. Di tevayiya 17 wilayetên Tirkîyê ku tê de gelhe hemî kurd e yan jî nisbeta Kurdan bilind e, meriv, li gora jimartinên fermî (resmî) yên 1960, 8817 gund ku 395 ji wan rûniştevanên wan ji 100 kêmtir in, 513 bi 101-500 rûniştevan in, 1891 bi 501-1000 rûniştevan in, 372 bi 1001-2000 rûniştevan in, bitenê 39 ji wan bi 2000 rûniştevan bêtir in, dibîne.

Sê wilayetên Mûşê, Hekarî û Wanê, karin weka nîşe bîn hesabandin:

	Aqar Km2	Rûniştevan	Kesafet di km2 de	Jimara qezan	Jimara gundan
Mûş	8.195	167.638	20	15	368
Hekarî	9.532	67.766	7	12	133
Wan	18.619	211.034	11	21	557

Ango, gund hinek ji hev dûr in, û nisbeta rûniştevanên wan ne weka hev e, li gora tabloya jêrîn:

	Ji 100 rûniştevan kêmtir	101-500	500-1000	1000-2000	+ 2000
Mûş	9	280	64	14	1
Hekarî	5	84	40	5	0
Van	39	456	51	11	0

Nisbeta navîn a gundên piçûk ku tê de 50-300 rûniştevan hene li Kurdistana Iraqê jî tê dîtin, li navçeya Rawandûzê (Barth, II) û li navçeyên din; û 300 rûniştevan jî nisbeta navîn a gundên kurdî yên Iranê ye.

Bilindbûn jî sedemeke pirr giring e di cihbûna gundekî de. Eger em xwarbûnên sewiyan di Xarita Hütteroth de, li Başûrê gola Wanê, li navçeya Hekkarî, binêrin, emê bibînin ku gund di bilindbûna 1000-1500 m. de hinek pirr in, di bilindbûna 2000-2500 m. de hindik in, û di bilindbûna ku ji 2500 m. bêtir e hunda dibin, di eksê gundên zozanan de. Di bilindbûnên navîn de, meriv rastî çend cihên zivistanîyên xweş tê. Bi vî awayî, li Kurdistana Iraqê, li wilayeta Dehokê: Zawîsa, 1.400 m., di nivê daristanên fireh ên çam de; Suwaretuka, 1.675 m., di nav darên "servi" û "akagaç" de; Sersing, 1.046 m., bi kaniyên ku dipijiqin; Sulav, 1.150 m., û şelalên wê; Ser-Amadya, 1.905 m. Li wilayeta Sileymaniyê: Ser-Çinar, bi biyên bilind, weka ku navê wî nîşan dide. Li wilayeta Erbilê: Salah-el-Dîn, 1.090 m.; Şaklawa, 565 m., bi beçeyên wê yên dewlemend, li piyê Saffînê; Galî "Alî Beg", eynî bilindbûn, bi şelaleke mezin, û bi hêzanî, Hacı-Umran, 1.780, di havîne de pirr hênik e û di zivistanê de stasyona skî ye.

Li navçeya Hekkarî, serên bilind ên çiyayê Cilo, 3.500-4.000 m., ev çend sal e alpînîstên biyanî dikişînin (B. Amy, La Montagne des autres. Alpinisme en pays kurde, 1972, tevî wêne û biblyografîya gerrên dawîn).

Çiqas gund piçûk be, ewqas konfora wî hindik e. Li Kurdistana Tirkîyê ehwa ye. Di nivê gundan bêtir de, ava vexwarinê, aş, dibistan, çayxane, mêvanxane, tu nene. Awayê ronîkirinê pirr besît e, saxî kêr e. Bîr, eger hebin, nêzîkî destavan in. Di zivistanê de, ji sedema tunebûna riyên baş, bi sedan gund ji dinyayê dûr dibin (E. Esenkova, 55-7). Li gundên kurdî, li Iraqê jî, ewha ye. Ji sedan gundên wilayetên Sileymaniyê, Erbilê, Kerkûkê, elektrîk û ava paqij bitenê di 22 gundan de hene (Khosbak, 56-7). Ji gelheke teqrîbî ya 8.766.000, di 1962 de, bitenê 150 nexweşxane, 987 nexweşxanên bêpere, 18.256 livîn, 2.890 doktor û 1771 nexweşnêr (hemşîre), ji bo hemî Iraqê, di 1970 de, hebûn (Wezaretê Informasyonê. Iraq pêş de diçe). Eynî rewş li Kurdistana Tirkîyê. Di 1967 de, 12.275 doktor hebûn, lê bitenê 2.500 ji bo hemî Anadolû, bi 60.196 livîn ku nêzîkî nivê wan bitenê ji bo bajarên Istambûlê, Ankarê û Izmîrê bû. Malarya (nexweşiya ta) bi hêzanî digihêje wilayetên kurdî yên Diyarbêkrê, Siirtê û Hekkarî (E. Esenkova,



Tîp û cil - Kurdên dewlemend (Wênekêş: E. Ronjat)
Elisée RECLUS, Nouvelle Géographie Universelle, 1884

87-8). Li Kurdistana Iraqê, malarya ku bû bû sedema çarîkê mirinê li Iraqê (Dr. A. Ghalib, Malaria and malaria in Iraq, Bagdad 1944) ji dema kampanya O.M.S. (Organisation Mondiale de la Santé), di 1954-1956 de, ne maye (J. Manevy, Il est quatre heures docteur Malaria, Réalités, N° 122, adar 1956, 48-55). Li Kurdistana Iranê bitenê 250-300 livînên nexweşxanan = 1 ji bo 10.000 kes hene (Qasimlo, 32).

R ê

Ji bo ku Kurd ji gundekî here gundekî din û pêwendiyên civakî û malbatî, ên hevaltiyê, ên êlî û bazarî, bike, ew riyên piçûk ku gundan girêdidin hevdu, yan riyên firehtir û çêtir ku qîmeta wan a bazarî yan stratêjîk heye û ku ji aliyê hikûmetên ku menfeetên wan li wira hene hatine çêkirin, distîne. Di çiyên de, riyên piçûk ên hêstiran pirr caran di dirêjayiya çemê piçûk ku di kûrbûna geliyê de diçe derin û ji alîkî wî derbas dibin aliyê din, yan jî di dirêjayiya kêleka çiyê de, ku gelek caran pirr bilind û bitehlike ye, diçin. Ev rê, ji bo gihajtina kêlekên ku carna bilind in, diwar in. **Nîşe:** Li Kurdistana Iraqê, Paykulî, 1.000 m.; Sagirma, 1.700 m.: ji bo ku meriv çemên piçûk derbas bibe, ji cihên ku av tê de nizm e diçe, meriv bi kelekan (celebêkî qayixa pan) yan bi piran derbas dibe. Pirên kurdî hîn jî kevna in û carna bitehlike ne, ji ben û werîsan (Layard, 1970, 166; Bishop, II, 114), gişlên daran (Wigram, 288; Hamilton, 96) hatine çêkirin. Li ser riyên giringtir, pirên kevn ji kevirên gilover ên bi yek yan gelek qenteran in. Îro, li gelek cihan, pirên nuh ên hesinî cihê van pirên kevnar ku ji berê bitenê gengaziyên (wasite) derbasbûnê bûn distînin (Hamilton, 192). Gelek efsane girêdayî van pirên kevn in (C. J. Edmonds, 201,

212, 247). Di deştan de, bi hêzanî li Kurdistana Tirkîyê, hîn gelek riyên besît ên ji axê û ku bitenê di mewsima xweş de bi kar tên hene. Lê, riyên nuh ên ji kevir û zift jî tên çêkirin. Riyên kêlekên çiyên pirr caran eserên huneriyên (fennî) rast in.

Kurdistana Iraqê îro tije riyên xweşik ên ku pêwendiyên mirovî hêsan dikin e. Li Iraqê, rê yan riyên piçûkên baş Mawşilê girêdidin Zaxo, Amadya, Erbîlê, Akra. Ji Erbîlê meriv diçe Harîrê, Rawendûzê û Kerkûkê, û paşê Sileymaniyê. Li Tirkîyê, riyek ji Malatyê diçe Elazigê, Tuncelî, Erzincanê, Aşkala, Erzurûmê û Karsê. Ji Elazigê riyek diçe Bingolê, Mûşê û Tatvanê û yekî din diçe Diyarbekrê, Mêrdînê û Nusaybînê. Ji Diyarbekrê meriv kare berê xwe bide Silvan û Siirtê yan Silvanê, li ser riya Bitlîsê, Tatvanê û Wanê, bi gengaziya rê yan gemiyê, li ser golê.

Riyên trênan ku ji Kurdistana derbas dibin hindik in. Meriv kare, li Tirkîyê, riya Erzincanê, Erzurûmê û Karsê, ber bi Ermenistanê; riya Malatyê, Elazigê, Gencê, Mûşê, Tatvanê û Wanê, bi qayixan, ber bi Tebrîzê; riya Malatyê, Sivrecê, Madenê, Erganî, Diyarbekrê, Batmanê, ber bi Siirtê, nîşan bide. Orient-Express ê Istambûlê ji Helebê derbas dibe, gelheyên kurdî yên sînora tirkî-sûrî peya dike, digihêje Mawşilê û Bagdadê. Li Kurdistana Iraqê, bitenê riyek teng a trênan ji Begdadê diçe Kerkûkê (320 km.).

Çend riyên ezmanî, ji bo karên leşkerî, ji bo meydanên balefiran ku li Kurdistana ava bûne, bi kar tên. Giringtirinên wan li Tirkîyê ne: Erzurûm, Kars, Karaköse (Agirî), Elazig, Malatya, Wan, Diyarbekir; li Iraqê: Mawşil, Kerkûk, Semel, Ser-Amadya, Bamernî; li Bakurê Sûriyê: Qamişlî; li Iranê: Sanandaj, Kermaşah, Ridaye.

Aliyê Antropolojîk ê Kurdistana

Gelê kurd ku di çaryana gelheyên ewqas cihê, weka gelên tirk, faris, qefqas û ereb, de ye, û ku pêwendiyên wî yên pirr nêzîk bi piraniya wan re hene, gelo sifetên wî yên ku wî ji wan bi awakî vekirî cihê dikin hene? Meriv kare ji xwe vê pirsê bipirse, û gelek zanan tecrûbê kir ku aliyên antropolojîk (ên zanistîya beşerî) ku ji vê veqetandinê re izn didin derxînin. Bi taybetî, em naxwazin li irqekî kurdî bigerin. Ev mefhûmê irq nikare tucar li ser mirovan bê tetbîq

kirin, li gel ku meriv di nav gelheyên nêzîkî hev, ên ku xwediyên vê yan vê sifeta xwînî ne (Ruffié, 1972), ferqên jênêtîkên giring dibîne. Lêkolînên antropolojîk li ser Kurdan ji berê sedsalekê bêtir, bi E. Dehousset (1863) û N.V. Xanikoff (1866) re, dest pê kir. Ew li hemî navçeyên Kurdistana hatin çêkirin.

Ev lêkolîn, di destpêkê de li Iranê, ji aliyê nivîskarên jorîn çêbûn; li piştî-qafqasyê, ji aliyê E. Chantre (1880,

1890) û Pantuxoff (1891); li Tirkîyê, di geliyên nav bera Diclê û Feratê de, (G. Pisson, 1892), li Başûrê Deryayê Reş li Karakûşê, li çiyayê Nemrûdê, li Rojavaya gola Wanê û li Zencirli (Von Luschan, 1922); li Sûriyê, li Şamê (Ariëns Kappers, 1931). Yezîdiyên Qafqasyê ji aliyê Elieyev, di 1887 de, û di 1900 de, ji aliyê Ivanovskî, hatin lêgerîn; Yezîdiyên Sincarê, Şayxanê û Kurdên Iraqê, ên Zaxo, Rawendûzê, Akra, Kerkûkê û Sileymaniyê, ji aliyê Field (1934). Ev lêkolînên dawîn bitenê di 1951-1952 de hatin weşandin. Hemî ev lêkolîn bitenê lêgerînên sivik in (sondage), ji sedema piçûkbûna jimara merivên ku hatin lêgerîn (çend sed ji hezaran rûniştevan) û a pîvanên zanistî yên ku hatin berev kirin. Çend gervan (merivên ku li Kurdistanê geriyên) ji aliyê xwe çend lîsteyên çêkirin û çend wêneyên xusûsî xistin dosyê. Li gel hemî van tiştan, û ji bo ku balkişandinên li ser Kurdên navçeyên cihê bûn, netîcên ku hatin stendin ne bicarek weka hev in. Rêzkirina wan a antropolojîk hat tecrube kirin (A. Baxamakoff). Bi vî awayî, Kurdên Rojavayî (Von Luschan) û Kurdên Rohilatî yan Başûrî ji hev hatin cihê kirin. En yekemîn ewê tîpên wan kej be, çavên wan şîn bin û serê wan dirêj (dolichocéphale) be. En din, tîpê wan ewê esmer be, çavên wan reş bin û serê wan kin (brachycéphale) be. Hin wan ji eynî irqê Tirkan dihesibînin (Sekban Ivan) yan ê Iraniyan (Modi). Hin jî wan nêzîkî Erebb û Ermeniyên dibînin. Çend wêneyên Mark Sykes (321, 342, 373, 424-5, 427, 429), ên Lynch (II, 4-5) yan ên Soubrier (112, 113, 144, 160, 172), di destpêkê de di-hêlin ku meriv li ba Kurdan tîpên Ereban, Yehûdîyan, Tewratiyan, Nestûriyan û Tirkmenan bibîne. Ev netîce ji aliyê H. Fields tê tesdîq kirin û bi awakî zanistîtir, di wêneyên 162 kesan de (ji 598 kes) ku hatin muayene kirin, tê nîşan dan. Ew, di van wênan de tîpên ermenî (48), balkanî (12), ên Deryayê Sipî yên hinek guhertî (36), euro-anatolî (38), safî yan tevlihev yên Iraniyan (4), alpî (12), mongol (1) û reş (1). Ev nisbet li ba 235 yezîdiyên ku hatin muayene kirin ne eynî ne, û pîvana wan bi Aşûriyan, Ereban, Şemmeran û Şulubayan yan Tirkmenan ku ew jî ji aliyê vî nivîskarî hatin lêgerîn, bala meriv dikişîne. Bê gûman, sedema nêzîkîyên ku hatin dîtin zewacên miqabil (di nav bera etniyan de) e. Lê, ev manî nabe ku E. Duhousset (1863) ji gelê kurd re yekbûneke nadir (pirr kêr), ji aliyê tîpê wî, bipejire (qebûl bike). Ariëns Kappers (1931) qebûl dike ku Kurd, li gel cihêbûna wan a antropolojîk, irqekî bi rastî cihê teşkîl dikin. Bi vî

awayî, em karin, bi kurtkirina lêkolînên H. Fields, wêneya Kurdê Iraqê ewha çêkin: "Kurd bejna wî navîn e (1,66 m.), jorê wî dirêj e û çîpên wî kurt in. Eniya wî fireh e û serê wî gilover e. En bi serên kin (brachycéphale) bêtir in. Bilindbûna rû navîn e. Poz pîr caran xwar e. Kurd ji Erebb bipirçtir e. Porê wî, hinek bipêl û nerm, qehwerengiyê girtî ye, û çavên wî reş in. Lê porên kej û çavên şîn jî tîpên dîtin, bi hêzanî li navçeyên rojavayî. Rengê çermê wî ji ê Erebban vekirîtir e, lê ne weka ê Aşûriyan xweşik e. Diranên wî tebîî ne û baş hatîne çikandin. Parzû (edelat) û saxiya wî, weka yên merivên ku hatin muayene kirin, bi awakî giştî baş in". (Th. Bois, 18).

Li gel hemî van tiştan, ev lêkolînên antropolojîk li ser Kurdan pîr perçekirî û ne emîn in, ji bo ku meriv karibe netîcekê li ser eslê vî gelî bistîne. Pîr pêwîst e em lêgerînekê li ser ziman û dîroka wî bigihênin vî lêkolînê.

Dawî

Bioyografi

XARITE: Tu xariteke zanistî û qediyayî "mukemmel" ya Kurdistanê tu neye. Xarita Kurdistanê ya bi 1/4 000 000, Qahire 1943, bi hêzanî dixwaze "wêneke xêzikî ya cihê ku Kurd li Rojavaya Navîn vedigirin nîşan bide"; nota ji 12 rûpel ku pê ve ye, amanca wê nasdan û meşrû kirina zanînen cihê ye. Die Kurden, Volke ohne Staat, a bi 1/1 500 000, weşana Die Aktuelle Landkarte, N° 224, Munich 1966, a vekirî û besît, ew jî xwarbûn û nîzmbûnan nîşan nade. Ji bo Tirkîyê, xaritên kevn ên H. Kiepert, 1892, yan jî Türkiya, 1/1 000 000, a Faik Sebrî, Istambûl 1948, xarita Asya Rojavayî, 1/1 000 000, ya Leşkerên Rojavayê, Beyrût 1939, yan xaritên War Office (Buroyê Şerr) û Air Ministry (Wezaretê Ezman), London 1961-2, 1/1 000 000, rûpel NJ37 Erzûrûm, NJ38 Tabrîz û N138 Bagdad, rêzên 1301, GSGS, hemî Kurdistanê digrin. Gelek caran, di çîrokên gerrên cihê de, xaritên ku pîr-kêr sazîrî ne tîpên dîtin. Meriv di pirtûka û di gelek gotarên C.J. Edmonds de xaritên rast û bitefsîl hez dike (teqdir dike).

BERHEVOKEN WENAN (Album): Ji bo ku hemî bi wênan bînen nîşandan: M. Zikmund, J. Hanzelka, Kurdistan, country of Insegregation, Legends and Hope, Artia (Çêkoslovakya) 1962; K. Dettman, Vertraue der Pranke ... Löwe die Heiligen werden dir nicht helfen, Hamburg 1966.

COGRAFYA: C. Ritter, Die Erkunde von Asien, VIII, Berlin 1839, Kurdes du Khorasan, 392-400, IX, 1840, Kurdes de Perse, 412-762, 1009-48, X, 1843, Kurdes du Tigre et de l'Euphrate, 690-734, XI, 1844, Kurdes occidentaux, 3-247; F. Maunsell, Geography of Eastern Turkey in Asia, Aldershot 1899; Elisée Reclus, Nouvelle géographie universelle, Paris 1884, IX, Asie antérieure, 203-6, 337, 339, 342-55, 411-518; V. Cuinet, La Turquie d'Asie, II, 1891; Vidal de la Blache!Gallois, Géographie Universelle, VIII, ch. VIII, Blanchard, 215-27, Paris 1929; M. Clerget, La Turquie, Passé et Présent, Paris 1938; J.-P. Roux, la Turquie, Paris 1957; X. de Planhol, les fondements géographiques de l'histoire de l'Islam, Paris 1968; S. I. Brouk, L'ethnographie des pays du Moyen-Orient, bi fransizî ji rûsî hatiye wergerandin: Documents Français, Travaux et recherches, N° 13, 1961; Genel nüfus sayımı, 25 ekim 1960, Census of Population, 25 oct. 1960, Ankara, Devlet Enst. Statist. N° 444, 1963; R. Montagne, Quelques aspects du peuplement de la Haute-Djéziré, BEO, Şam, II (1932), 53-66+XVII Pl.; Seydo Goranî, Min "Amman ila l-Amadiyya, Qahire 1938; P. Rondot, les Kurdes de Syrie, dans France méditerranéenne et africaine, 1939/I, 81-126, 2 xarite; Aladîn Sicadî, Geshtik la Kurdistan, A Journey in Kurdistan, Bagdad 1956; Sh. Khosbak, ... Djughrafiyyat al-Irak, Min. Educ. Nation. Bagdad 1386/1966; M. al-Durra, al-Kadiyya al-kurdiyya, Beyrût 1963, 1966, augm.; C. J. Edmonds, Notes on Luristan, Bagdad 1918; eynî nivîskar, Luristan, Pish-i-Kuh and Bala Gariveh, G.J.?, LIX (1922), 335-56, 437-53.

ÇIROKEN GERRAN YAN BÎRHATÎ (xatire): C.J. Rich, Narrative of a residence in Koordistan, 2 vol., London 1836; J. B. Fraser, Travels in Koordistan, Mesopotamia, ... 2 cild, London 1840; H. Brugsch, Reise der K. Preussischen Gesandtschaft nach Persien, 1860-61, 2 cild, Leipzig 1862-3; F. Millingen, Wild life among the Koords, London 1881; H. Binder, Au Kurdistan, en Mésopotamie et en Perse, Paris 1887; Mrs. Bishop (I. L. Bird), Journeys in Persia and Kurdistan, 2 cild, London 1891; P. Muller-Simonis, Du Caucase au Golfe Persique, à travers l'Arménie, le Kurdistan et la Mésopotamie, Paris-Lyon 1892; Mme Chantre, A travers l'Arménie russe, Paris 1893; H. F. B. Lynch, Armenia, Travels and studies, 2 cild, London 1901, repr. Khayat, N° 15, Beyrût 1965; G. L. Bell, Amurath to Amurath, London 1911; E. B. Soane, To Mesopotamia

and Kurdistan in disguise, London 1912; M. Sykes, The Caliphs' last heritage, London 1915; G. E. Hubbard, From the Golf to Ararat; An expedition through Mesopotamia and Kurdistan, London 1916; W.R. Hay, Two years in Kurdistan: experiences of a political officer, 1918-1920, London 1921; E. S. Stevens, By Tigris and Euphrates, London 1923; H. Christoff, Kurden und Armenier: eine Untersuchung über die Untersuchung über die Abhängigkeit ihrer Lebensformen und Charakterentwicklung von der Landschaft, Hambourg 1935; A.M. Hamilton, Road through Kurdistan, London 1937, 1958; J. Soubrier, Moines et Brigands. De l'Adriatique aux Marches iraniennes, Paris 1945; F. Balsan, Les surprises du Kurdistan, Paris 1945; Fr. Stark, The valleys of the Assassins and other Persian Travels, New York 1934; A. Waheed, The Kurds and their country, Lahore 1955, 1958; B. Nikitine, Les Kurdes, Etude Sociologique et historique, Paris 1956; C. J. Edmonds, Kurds, Turks, and Arabs. Politics, Travels, and Research in North-Eastern Iraq, 1919-1925, London 1956; A. Qasimlo, Kurdistan and the Kurds, London 1965; Th. Bois, Connaissance des Kurdes, Beyrût 1965 (wergerandina ingilzî: The Kurds, Beyrût 1966).

ANTROPOLOJÎ: E. Duhouset, Etudes sur les populations de la Perse, Paris 1863; N.V. Khanikoff, Mémoire sur l'ethnographie de la Perse, Paris 1866; E. Chantre, Aperçu sur les caractères ethniques des Ansariés et des Kurdes, dans Bull. Soc. Anthropol. de Lyon, I (1882), 164-85; G. Pissou, Races des hautes vallées du Tigre et de l'Euphrate, dans Rev. scient., Paris 1892; XLIX (1892), N° 18, 557-60, N°19, 581-8; J. J. Modi, The Persian origin of the Kurds and Tajiks, dans J.A. Soc. of Bombay, IX, 493-9; E. Pittard, Ethnographie de la Dobroudja, Contribution à l'étude anthropologique des Kurdes, Lyon 1902; eynî nivîskar, les Races et l'Histoire, Paris 1924, 1932; F. von Luschan, The early inhabitants in western Asia, dans JRAI, XLI (1911), 221-44; eynî nivîskar, Völker, Rassen, Sprachen, Berlin 1922; A. Baschmakoff, Les Peuples autour de la Mer Noire dans leur état actuel, dans l'Ethnographie, 1930; C.U. Ariëns Kappers, Contributions to the Anthropology of the Near East, V: Kurds, Circassians and Persians, dans Koninglijke Akad. van Wetenschappen; Amsterdam Proceedings, Amsterdam, XXXIV/4 (1931), 531-41; Afet Inan, l'Anatolie, le pays de la "Race" turque, Recherches sur les caractères

K O V A R A J Î N

Nivîskar û wergervanê kurd M. E. BOZARSLAN, piştî ku di van salên dawîn de ji çîrok û meselên gelerî çend pirtûk weşandin (Meyro, Mîr Zoro, Gurê Bilûrvan, Serketina Mişkan û hwd.), kovara dîrokî ku di destpêka sedsala bîstan de dihat weşandin wergerand tîpên latînî û ji nû ve weşand. Bozarşlan, bi weşandina vê pirtûkê, xebateke pîrr giring pêşkêşî xwendekarên kurd û dîrokzanên biyanî kir.

Kovara JÎN di payîza sala 1918 de, ji aliyê nivîskar, helbestvan û zanayên kurd, li Istambûlê, bi kurdî-tirkî, bi tîpên erebî, derdiket. Ev kovar organa rêxistina "Kürdistan Tealî Cemiyeti" (tiştêk li ser vê yekê di kovarê de ne hatiye gotin) ya ne resmî bû. Weşandina vê kovarê nêzikî salekê dewam kir.

Ji nivîskar, helbestvan û zanayên ku di kovara JÎN de dinivîsîn, nivîskarê marşa "NEWROZ", Pîremerd (di JÎN de, navê wî Süleymaniyelî Tefvik e), bi nivîsar û helbestên xwe; Xelîl Xeyalî (di JÎN de, Kurdiyê Bitlîsî), bi nivîsarên xwe yên zanyarî li ser dîrok, mîtolojî, sosyolojî, ziman û felsefe; Kemal Fewzî, bi nivîsar û helbestên xwe; nivîskarê şanoya (piyes) "Memê Alan", Abdurrahîm Rahmî; Memduh Selîm (di JÎN de Memduh Selîm Begî, berpirsiyarê duwemîn ê Jînê); û bi nivîsarên li ser rewşa taze, xebatên zanyarî (ilmî), lêkolînên zanyarî û helbestên xwe, Azîz Yanulkî; Lav Reşîd; Siverekîlî Hilmî; serokê serhildana Agirî, Ihsan Nûrî; Kamran Alî Bedir-Xan; û gelek bîrewerên kurd ên din, hebûn.

Li ba van kesan, helbestên helbestvanên kurdên nemir di dîrokê de, di JÎN de dihatin weşandin.

Hejmara pêşîn di tarîxa 7.11.1918 û ya dawîn di 2.10.1919, de derket. Bi temamî 25 hejmar hatin weşandin.

Weka ku di destpêkê de hat gotin, ev kovar organa ne resmî ya "Kürdistan Tealî Cemiyeti" bû. Ew, di sala 1919 de bû organa resmî ya rêxistina "Kürd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti" ku di wê salê bixwe de hat saz kirin. Lê, weka ku M. E. BOZARSLAN dibêje, ev komele girêdayî "Kürdistan Tealî Cemiyeti" bû. "Kurd Tamim-i Maarif ve Neşriyat Cemiyeti" di belavoka ku di tarîxa 2.2.1919 de di JÎN

de derket vê yekê dide zanîn. Amanca vê rêxistinê xizmeta zanyarî û çandî ji bo welatevînên Kurdistanê bû.

Li gora ku tê gotin (Zinnar Silopî, Doza Kurdistan, r. 59-60) kovara JÎN, piştî hejmara dawîn, N° 25, ji aliyê komeke bîrewerên kurd ku ji "Kürdistan Tealî Cemiyeti" veqetiya bûn, weka rojnameke rojî derket. Lê, li gora BOZARSLAN, tu zanîn li ser van hejmarên JÎN ku weka rojnameke rojî derdiket xuya nîne. Lêkolîneke kûr li ser vê yekê ewê, bê gûman, pîrr hêja be.

Ji kovara Jînê bitenê yek kolleksyon ji barbarîzma dewleta tirk û nijadparêz a Kemalîzmê xelas bûye. Ewê hemî hejmarên wê di 5 cildan de derkevin.

Ji bo xwendin û fêhrbûna çanda kurdî û hisa netewî, siyasî û îdêolojîk a wê demê, û ji bo pêkanîna lêkolînan li ser wan, JÎN esereke hêja ye. Meriv dikare di JÎN de rewşa dîrokî, aborî, civakî û hwd. bibîne. Herweha, nasîna îdêolojîk û a xebata li ser zimên, dîrok û babetên din a nivîskarên Jînê ji bo xwendevanên kurd û kesên ku li ser Kurd û Kurdistanê lêkolînan dikin bi têgihajtina kovara Jînê mimkin e.

Jîn eserek mezin e. Weşandina wê xizmetek pîrr hêja ye ji bo çanda kurdî. Em nivîskar û wergervanê kurd, M. E. BOZARSLAN, ji bo xebata wî ya hêja pîroz dikin

JÎN, Kovara Kurdî-Tirkî, 1918-1919, Cild I. Wergêr, M. Emîn Bozarşlan

Weşanxana Deng
Box 3050 750 03 Uppsala Sweden

Hûn karin vê kovarê ji navnîşana Têkoşer jî, B.P. 33 - 1730 Zellik Belgique, bixwazin.

Buha: 150 Kron, 1.160 F.B.

J İ N D E R G İ S İ

Son zamanlarda Kürt halk hikaye ve masallarını (Meyro, Mîr Zoro, Gurê Billûrvan Serketina Mişkan û hwd.) derleyip yayımlayan ve Kürt kültüründe önemli bir yeri olan eserleri okurlara sunan yazar-çevirmen M.Emin Bozaslan be kez tarihi bir eser sunuyor.

Bozaslan'ın yeni çeviri eseri "Jîn" dergisi 1918 yılının sonbaharında İstanbul'da birçok Kürt yazar, şair ve düşünürleri tarafından Kürtçe ve Türkçe olarak arap alfabesi ile yayınlanmıştı. O tarihlerdeki kültür faaliyetlerini yürüten "Kürdistan Tealî Cemiyeti" nin açıkça belirtilmemekle beraber resmi olmayan yayın organı olarak basılan "Jîn" dergisi bir yıla yakın bir zaman yayınlandı.

"Jîn" de değerli Kürt yazar, şair ve düşünürleri arasında şu isimleri görmekteyiz:

"Newroz" marşının şairi Piremerd, makale yazarı ve şair ("Jîn'deki adı Süleymaniye li Tefvik).

Xelil Xeyali, tarih, mitoloji, sosyoloji ve felsefe yazarı (Jîn'deki adı Kurdîyê Bit lîsî).

Kemal Fevzi, yazar ve şair.

"Memê Alan"ı piyes halinde "Jîn'de yazan Abdurrahim Rahmi.

Memduh Selim, derginin ikinci yönetmenliğini ve sorumluluğunu üstlenmekte, yazar ("Jîn'deki adı Memduh Selim Begî).

Diğer yazar, şair ve araştırmacılar: Aziz Yamulkî, Law Reşid, Siverekli Hilmi, Ağrı dağı isyanı lideri İhsan Nuri, Kamran Ali Bedirhan ve daha birçokları.

"Jîn'de Kürt edebiyatının ölümsüz şairlerinin eserlerini de bulmak mümkün. Derginin ilk sayısı 7 Kasım 1918'de, son sayısı da 2 Ekim 1919'da yayınlanmış. Sayılarının toplamı yirmi beş.

Derginin yönetimini ilk olarak 1919'da kurulan "Kürt Tamim-i Maarif ve Neşriyyat Cemiyeti" üstlenmiş. Derginin Kürdistan Tealî Cemiyeti'yle ilişkileri bu cemiyet yönetiminin Kürdistan Tealî'nin elinde bulunmasından belli oluyor. Derginin yönetimini eline alan bu kültür derneğinin amacı Kürtleri bilimsel ve kültürel yönden eğitmek olarak açıklanıyor.

Bir başka iddiaya göre, "Jîn" dergisinin son çıkan 25'inci sayısından sonra Kürdistan Tealî Cemiyeti'nden ayrılan bir grup üye "Teşkilat-ı İctimaiye Cemiyeti" adında yeni bir örgüt tarafından günlük olarak yayınlanmıştır. (Zinnar Sılopî, Doza Kurdistan, s.59-60)

M.Emin Bozaslan'ın belirttiğine göre bu iddiayı doğrulayan bir bilgi bulunmamaktadır. Bu konuda yeni araştırmaların yapılmasında büyük faydalar vardır. Konuyla ilgili başka bir kayda değer nokta da şudur M.Emin Bozaslan'ın belirttiği gibi, kemalist rejimin Kürt kültürüne karşı barbarlığına karşı "Jîn" dergisinin ancak tek bir koleksiyonu korunabilmiştir. "Jîn" in tüm sayıları toplam beş cild olarak yayınlanacak.

20'inci yüzyıl başlarındaki Kürt aydınlarının ideolojik bakış açılarını, ulusal duygularını, siyasal faaliyetlerin ile örgütsel yapılarını, Kürt halkının ekonomik, sosyal ve kültürel durumunu öğrenmek isteyenler için "Jîn" dergisi eşsiz bulunmaz bir yapıttır. Ayrıca bu dergi ulusumuzun aydınlarına ve dünya kürdologlarının çalışmalarına çok yararlı olacaktır.

Kürt kültürü ve edebiyatına önemli katkılarda bulunan yazar-çevirmen M.Emin Bozaslan'ı bu önemli eseri okurlarına sunduğu için kutlarız.

s. 15'in devamı

yazarları, Kızılhaç teşkilatını, Bilim aamlarını ve Avrupa demokratik kamuoyunu. Beşikçi ile ilgilenmeye çağırıyorum.

"Sayın Beşikçi ile ilgili Türk devleti'nin bu uygulaması, Başbakanlık ve Adalet Bakanlığı nezdinde protesto edilmekle birlikte, Beşikçi'nin Avrupa'dan gönderilecek bir doktor huzurunda sağlık kontrolünden geçmesi ve insanca yaşamasına imkan verilmesi de istenmelidir."

Av.Şerafettin Kaya, Königsweh 65,2300 , Kiel 1, W. Deutcheland.

*

"Sayın Başbakan,

"Sayın Adalet Bakanı,

Sosyolog İsmail Beşikçi ve Komal Yayınları Sorumlu Yazı İşleri Müdürü Recep Maşaşlı'nın Türk hapishanelerinde ağır baskılara maruz bırakıldığını basın yolu ile öğrendik.

Biz bu baskıları şiddetle protesto ediyoruz!

Sizden bu baskıların durdurulması için şahsen ilgilenmenizi rica ediyoruz.

Ayrıca bu tutukluların derhal serbest bırakılmasını talep ediyoruz.

İ S İ M A D R E S M E S L E K İ M Z A

BÛYEREK LI AUSTRALIA

Konserên bi navê "Stranên Me Dostin" ku li Ewropa dengê mezînan, di heyva sibatê de li Australia jî hatin pêşkeşkirin. Ev konserên li Sydney û Melbourne, ji aliyê Federasyona Komelên Karikerên Tirk û Komela Kurd li Australia hati bûn amade kirin. Pîrr karkerên Kurd û Tirk li Australia bi dilekî xweş beşdariya van her du konserên Şivan Perwer Melike Demirağ, Gulistan û Şanar Yurdapın kirin. Bi vê yekê, wan pêşan da ku dostaniya gelan ne tiştê zor e.

Di vê navberê de, beşê Tirkî ya Radyoya 2EA ku weşana xwe ji bo derdorê Sydney dike, hevpeyvînek bi hunermendên li wîra, yê Kurd û Tirk ra çêkir. Balyozxana Tirk û hevalbendên wê bihîstin ku ev radyo hevpeyvînek çêkiriye. Wan li hember weşana vê hevpeyvîne xebat kir. Bi tehdîdên hember îdare û kesên beşa programa Tirkî ya Radyoya 2EA, ev weşana dan rawestan.

Li derdorê bajarê Melbourne Radyoya 3EA jî vê hevpeyvîne weka ku hebû weşand. Li ser vê yekê, Balyozxana Tirk û hevalbendên wê yên paşverû li ber deriyê Radyoya 3EA meşîneke protesto çê kirin.

Di vê navberê de, Federasyona Komelên Tirk, Komela Kurd li Australia û hunermendên Kurd û Tirk dixwest ku Radyoya 2EA jî vê hevpeyvîne biweşîne. Radyoya 2EA ew weşand, lê sansur danî ser her peyva ku li ser gelê Kurd bû. Ji bo vê sansurê, hunermendên Kurd û Tirk, Federasyona Komelên Tirk û Komela Kurd, Radyoya 2EA bi awakî ciddî protesto kirin. Wan, karbidestên Australia jî li ser vê rewşê agadar kirin. Û di eynî zemanî de daxwaziya weşaneke Kurdî ji bo karkerên Kurd li Australia kir. Ev xebata wan hê jî berdewam dike.

Me bi navê Têkoşer, ji wezîrê karên biyanîyan (Ministry of Immigration) re na mek şand, û zexeliya Balyozxana Tirk û hevalbendên wê yên paşverû û Radyoya 2EA protesto kir. Me piştgirtiya xwe bi Federasyona Komelên Tirk û Komela Kurd li Australia ra ji bo xebata wan a demokratîk û daxwaziya wan ji bo weşaneke bi Kurdî di radyo de da zanîn.

Hun li jêr, nama bi zimanê Ingilîzî ku me ji wezîrê karên biyanîyan re şand dibînin:

Ministry of Immigration
Canberra
Australia

Dear Sir,

We, the Kurdish Workers and Students' Union in Belgium has been informed that the Kurdish and Turkish musicians, namely Şivan PERWER, Gulistan, Melike DEMIRAG and Şanar YURDATAPAN gave two concerts called "Our songs are sisters".

One concert took place on the 9th of february 1985 at Sydney and the second on the 16th february 1985 at Melbourne.

These two concerts were organised by the Federation of Turkish Organisations and the Kurdish Union in Australia.

During the period that the Kurdish and Turkish musicians were there, they have been interviewed by the radio station 2EA, for the region of Sydney.

This interview had been done to be broadcast, but by the threatening intervention of the Turkish Consulate and their co-operator, Mr. Ertugrul INCEKARA, the radio broadcasting personal was put under pressure.

First, the broadcasting of the interview was cancelled and later, under the pressure of the Federation of Turkish Organisations and the Kurdish Union in Australia, it had been broadcast, but with a lot of censure of that wich concerned the Kurdish people.

The same interview has been completely broadcast on the radio-station 3EA, without any problem and without censure.

The co-operators of the 3EA radio-station openly declared their displeasure against the fanaticism of the Turkish consulate and the censure of the 2AE radio-station.

Shortly after that, on the 22th of february 1985, there had been a protest action against the 3EA radio-station, organised by the co-operator of the Turkish consulate, Mr. Ertugrul INCEKARA, and fanatic Turkish organisations in Australia.

AVUSTRALYA DA BİR OLAY

Avrupa'da coşku ile karşılanan "Türkülerimiz Kardeşdir" konserleri, şubat ayında Avustralya'da da seyirciye sunuldu. Avustralya'nın Sydney ve Melbourne şehirlerindeki konserleri, Avustralya'daki Türk Dernekleri Federasyonu ve Kürt Derneği tarafından düzenlendi. Şıvan Perwer, Melike Demirağ, Gülistan ve Şanar Yurdatapan'ın katıldığı konserlere, Avustralya'daki göçmen Türk ve Kürt işçileri büyük bir coşku ile katıldılar. Böylece halkların kardeşliğinin hiç de zor olmadığını gösterdiler.

Bu arada Avustralya'daki Türk işçileri için, Sydney civarına yönelik olarak yayın yapan 2EA radyosu, Kürt ve Türk sanatçıları ile röportaj yaptı. Röportajın yapıldığını duyan Avustralya'daki, Türk Konsolosluğu yetkilileri ve işbirlikçileri, röportajın yayınlanmaması için harekete geçtiler. 2EA radyosunda yönetimini ve Türk elemanlarını tehdit ettiler. Ve böylece yayın durduruldu.

Melbourne çevresinde yayın yapan 3EA radyosu ise aynı röportajı olduğu gibi yayınladı. Bundan dolayı Türk konsolosluğu ve gerici işbirlikçilerinden oluşan bir grup ile radyo evini protesto ettiler.

Türk Dernekleri Federasyonu, Kürt Derneği ve Kürt-Türk sanatçılarının baskı ve protestosu üzerine 2EA radyosu da röportajı yayınladı, ama bu sefer Kürtler ile ilgili bütün bölümleri sansür etti. Bu yüzden Türk Dernekleri Federasyonu, Kürt Derneği ve sanatçılar 2EA radyosunun tutumunu en sert bir şekilde protesto ettiler. Avustralya'da demokratik çalışma yapan Türk Dernekleri Federasyonu ve Kürt Derneği Avustralya makamlarının nezdinde harekete geçtiler, durumu ilgili yerlere bildirdiler ve devamlı Kürtçe yayın yapılması isteğinde bulundular.

Bu iki kuruluşun bu yöndeki çalışmaları halen devam ediyor.

Avustralya'daki Türk Konsolosluğu ve işbirlikçilerinin olumsuz tavırlarını, biz TEKOŞER olarak gerek Avustralya'nın ilgili makamları nezdinde ve gerekse radyo yönetimi nezdinde protesto ettik. Aynı zamanda, Türk Dernekleri Federasyonu ve Kürt Derneği ile dayanışmada olduğumuzu ve Kürt işçileri için radyo da Kürtçe yayın hakkının verilmesi isteğinden de bulunduk.

Aşağıda Göçmenlik Bakanlığına gönderdiğimiz İngilizce mektubu olduğu gibi yayınlıyoruz:

The Turkish consulate was really upset by the transmission of the 3EA radio-station.

As you can see, dear Sir, not only in Turkey does the Turkish authorities try to put pressure on the Kurdish people, but also abroad, in democratic countries where they want to put an end to Kurdish people and culture.

However, they forget that the reality of the existence of a nation and his culture cannot disappear with lies and repression.

We, Kurdish Workers and Students' Union in Belgium are against the crime committed by the Turkish consulate and their co-operators in Australia and we declare our solidarity with the democratic Federation of Turkish Organisations, which is represented by Mr. Umran BARAN, and the Kurdish Union in Australia, who want to realise Kurdish radio-broadcasting.

We request, kindly, from you to give to the Kurdish immigrants in Australia the possibility of the realisation of Kurdish radio-transmission.

We are looking forward to a favourable and early answer.

Yours faithfully,

XEBATA ME

18 ÇILE

Şeva P.O.S., Partiya Karkeran a Sosyallîst a Belçîka, li ser Tirkiyê. Di vê şevê de, filmeke "vidêo" hat nîşan dan û piştî wê pirs û bersiv li ser Tirkiyê û Kurdistanê çêbûn. Em jî bi raxistina pirtûk û kasetên kurdî beşdar bûn.

19 ÇILE

KAJ, Cuhanên Katolîkên Flaman, rojeke giring, li Houthalen, li ser hemî pirsên karkerên biyanî amade kir. Nêzîkî 500 kes beşdar bû bûn. Berpirsiyarên partiyên flaman û çend parlamenter bersivên gelek pirsan dan. Skeç, stran û folklorên biyanî û belçîkî hatin pêşkêş kirin. Em bi stranên kurdî yên zarokan û raxistina pirtûkan beşdar bûn.

25 ÇILE

Şeva Halk Evleri, li Anvers, li ser Tirkiyê: gelek hozanên tirk û hozanê kurd Heval vê şevê şah kir. Em bi silavnamekê beşdar bûn.

23 SEBAT

Karnavala komela belçîkî ya mezin, CNAPD, li Bruxelles. 48 kes ku 48 çekên atomî yên ku li Belçîka tên danîn temsîl dikirin, ji Florenne, bajarê ku ev çek tê de hêdî hêdî tên danîn, peyatî hatin heta Bruxelles. Li Bruxelles, di salona mezin La Madeleine de, ev karnaval çêbû. Gelek komên belçîkî û biyanî, piştî axaftinan, şevê şah kir. Em jî bi stranên zarokan û bi raxistina pirtûk û kasetên kurdî beşdar bûn.

2 ADAR

Rawestanek li Marcinelle, li ber monumana 263 karkerên ji 10 cinsiyetên cihê, lê ku piraniya wan Italî bûn, û yên ku di 8.8.1956 de, ji sedema hilweşana bîrekî komir, mirin. Ev xebat ji aliyê Koordinasyonê ku 212 komel (tevî 2 sendîka) endamên wê ne, hat amade kirin, ji bo protestokirina rêzana (siyaseta) hikûmeta Belçîka li dijî karkerên biyanî. Piştî wê rawestanê, şevê li zanîngeha Charleroi çêbû. Em bi stranên zarokan û bi raxistina pirtûkan beşdar bûn.

10 ADAR

Muzîka kurdên Arnem, li Hollanda: me li

wira pirtûkên kurdî raxistin.

17 ADAR

Rêveçûna mezin (nêzîkî 200.000 kes) li dijî danîna çekên atomî li Florenne.

21 ADAR

Vekirina raberîya (exposition) wênekêşan û ya wêneyên zarokan, ku ji aliyê Mrax, Komela dijî Nijadparêziyê, hat amade kirin.

23 ADAR

Şeva çandî ya marokî ku ji aliyê UNEM (Yekîtiya Netewî ya Xwendekarên Marokî), li zanîngeha U.L.B., li Bruxelles, hat amade kirin, ji bo protestokirina rêjîma xwîniya marokî. Em bi stranên kurdî û bi raxistina pirtûkan beşdar bûn.

JI ALIYÊ WEŞANÊ

- Di radyoya azad, PANIK, de me dest bi bernameke kurdî kir. Her yekşem, ji seet 12 heta 14, em bi 5 zimanan: kurdî, tirkî, erebî, fransîzî û flamanî, rewşa Kurd û Kurdistanê ya îro û ya buhurî, û mûsîqa û stranên kurdî, pêşkêş dikin.

- Di Çile 1985 de, me broşurekê, bi fransîzî û flamanî, li ser xebata me ya sala 1984 weşand.

BEREVKIRINA DOKUMANAN LI SER KURDAN

- Residence in Koordistan (cild II), C. J. Rich, London 1836

- Kurdish Facts (kovar: 3 hejmar) West-Asia, International Society Kurdistan, Amsterdam 1962, 1963.

- Kurdische Handschriften, Beschrieben von Kamal Fuad, Wiesbaden 1970.

- Kurds, Turks and Arabs Politics, travel and research in North-Eastern Iraq, C.J. Edmonds, London 1919 - 1925.

- La Turquie d'Asie (cild II), Cuinet Vital, 1891.

- La Syrie, Philippe Rondot, Parîs 1978.

- L'Irak, P. Rondot, Parîs 1979.

TÊKOŞER'DEN HABERLER

18 Ocak

P.O.S., Sosyalist İşçi Partisi'nin Türkiye üzerine gecesi. Gecede video filmi gösterildikten sonra Türkiye ve Kürdistan üzerin tartışma yapıldı. Geceye kitap ve kaset sergimiz ile katıldık.

19 Ocak

KAJ, Flaman Katolik Gençliğinin Houthalen'de yabancılar ile ilgili önemli bir gün hazırladı. 500 kişiye yakın kişinin katıldığı günde, Flaman partilerini temsilen bir kaç parlamenter seyircilerin sorularını cevaplandırdılar. Göçmenlerin skeç, müzik ve folkloru sunuldu. Tekoşer'in çocuk korusu ve kitap sergisi ile bu güne katıldık.

25 Ocak

Anvers'te iki Halk evinin düzenlediği, "Halk Gecesi"ne Türk ozanlarını yanında Kürt ozanı Heval de katıldı. Mesaj ile katıldık.

23 Şubat

CNAPD'nin Brüksel'deki karnavalı. Belçika'ya yerleştirilen 48 nükleer raketeri temsilen, raketlerin yerleştirileceği Florenne şehrinden Brüksel'e, 48 kişi yaya olarak yürüdü. Konuşmalardan sonra Belçika'lılar ve göçmenler geceyi şahlandırdılar. Biz de çocuk korusu ve kitap sergimiz ile katıldık.

2 Mart

Marcinelle'deki, çoğunun İtalyan olduğu 10 değişik milliyetten 263 işçinin anıtı önünde anma toplantısı yapıldı. Bu işçiler, 8.8.'56 da, kömür ocağının çökmesi üzerine ölmüşlerdi. Anma toplantısını 212 örgütün (iki sendika dahil) üyesi bulunan Koordinasyon tarafından yapıldı. Anma toplantısının amacı Belçika hükümetinin göçmen işçilere karşı olan tutumunu protesto etmek idi. Toplantı - dan sonra Charleroi Üniversitesinde gece oldu ve biz çocuk korumuz ile kitap sergimiz ile katıldık.

10 Mart

Arnhem (hollanda) deki Newroz: kitap ve kaset sergimiz ile katıldık.

17 Mart

200.000 kişinin katıldığı Atom silahlarına karşı yürüyüşe katıldık.

21 Mart

U.L.B.- Brüksel'deki Fas Ulusal Öğrenciler Birliğinin, Fas'ın kanlı rejimi ne karşı ve kültür gecesine Kürtçe müzik, şarkı ve kitap sergimiz ile katıldık.

Yayın Alanındaki Çalışmalarımız

Serbest Panik radyosunda Kürtçe yayına başladık. Her pazar günü saat 12 - 14 arası, 5 dilde : Kürtçe, Türkçe, Arapça, Fransızca ve Flamanca yapılacak programlarda, Kürdistan ile ilgili geçmiş-aktüel durumu, müzik ve türküleri sunulacak.

Ocak '85 te Fransızca ve Flamanca dillerinde 1984 yılı ile ilgili bir çalışma raporu yayınladık.

Kürtler İle İlgili Belgelerin Toplanması

-Residence in Koordistan (cilt II), C.J. Rich, London 1836.

-Kurdish Facts (dergi, 3 sayı), West-Asia, International Society Kurdistan - Amsterdam, 1962 - 1963.

-Kurdische Handschriften, Beschrieben Von Kamal Fuad, Wiesbaden 1970.

-Kurds, Turks and Arabs politics, travel and research in North Eastern Iraq, C.J. Edmonds, London 1919 - 1925.

-La Turquie d'Asie (cilt II), Cuinet Vital, 1891.

-La Syrie, Philippe Rondot, Paris, 1978.

-L'Iraq, P. Rondot, Paris 1979.

Dûmahiya r. 25

anthrop. des populations de la Turquie. Enquête sur 64 000 individus, Genève 1941; H. Field, The Anthropology of Iraq, Part. II, N° 1: The Northern Jazira, N° 2: Kurdistan, N° 3: Conclusions, 1952; Peabody Museum, Harvard Univ. vol. XLVI/1-3 (1951-I); E. von Eickstedt, Türken, Kurden, und Iranier seit dem Altertum. Probleme einer anthropologischen Reise, Stuttgart 1961.

(Th. Bois)

J Î N

KOVARA KURDÎ-TÛRKÎ ❖ KÛRDÇE-TÛRKÇE DERGÎ

1918-1919

Cild I

Wergêr
ji tîpên Erebî
bo tîpên Latînî:

Arap harflerinden
Latin harflerine
çeviren:

M. EMÎN BOZARSLAN

عدد ۱

۷ تشرین ثانی ۱۳۳۴

برنجی سنه

ساک ۲۲۰ فروشه
نیف سال ۱۳۰



درج اولوتیمان مقاله
اعاده ایداز



ژین

م. ع. ب. ز. س. ل.

سنه لی ۲۲۰ فروشدر
آلی آینی ۱۳۰ فروشدر



مس-لکزه موافق مقالات
مع المنوتیه درج اولتور



دین، ادبیات، اجتماعیات و اقتصادیاندن بحث ایدر تورکجه-کوردجه مجموعه در